

Berpîrsên partî û rêxistinên demokratîk ên li Tirkiyeyê:

Divê riya çareserîya kêşeya kurd vebe

Me li ser bêdengiya êrîşên li ser gelê kurd dîtin û ramanên derdorên muxalîf pîrsî. **Serokê SîP'ê Aydemir Güler** dide zanîn ku wan li gorî daxwazê piştewaniya gelê kurd nekiriye, **Serokê Mazlum-derê** diyar dîke ku helwesta hinek derdorên îslamî jî bîrdoza fermî ne cuda ye. **Serokê KESK'ê Siyami Erdem** dibêje: "Me berî êrîşan bang li derdorên demokratîk kir, lê jî kesî deng derneket." Her wiha **Serokê İHD'ê Akın Birdal** jî dide zanîn ku dê çareserîya kêşeya kurd riya demokrasiyê jî veke. (R.3)




Hunermend Gulistan:



Pêwîst e hedefa hunermendê kurd mezin be

Ev dem jî bo me pir girîng e. Kurd êdî fêrî jiyana bajarvaniyê dibin. Tu caran wekî îro fêrî jiyana bajarvaniyê nebûn. Ji ber ku her dem bajarên kurdan jî aliyê xelkê ve hatine birêvebirin. Tim desthilatdar li bajarên hebûne û kultura wan hinekî xurt bûye. Lê vê gavê êdî muzîkên me yên nû jî divê hinekî bajarî bin. (R.8-9)

Azadiya WELAT



SAMI TAN

Her wekî çawa bêyî erêkirina PKK çareserî nabe, bêyî erêkirina dewleta tirk jî riya danûstandinê venabe. Îro jî dewleta tirk jî çareseriyê dûr e.

Ji ber ku rojeva bûyerên siyasî ser her wekî çawa bêyî erêkirina PKK çareserî nabe, bêyî erêkirina dewleta tirk jî riya danûstandinê venabe. Îro jî dewleta tirk jî çareseriyê dûr e. Hikûmeta ku Ecevit ava bike dê wê ji çareseriyê hîn dûr bixe. her wekî çawa bêyî erêkirina PKK çareserî nabe, bêyî erêkirina dewleta tirk jî riya danûstandinê venabe. Îro jî dewleta tirk jî çareseriyê dûr e. Hikûmeta ku Ecevit ava bike dê wê ji çareseriyê hîn dûr bixe. Li her tiştî girtiye, ev çend hefte ne hinekî ji bêgavî, me jî daye ser vê riya bi çol û çiv e. Temet bi zanîn û şiyana xwe em rewşê şirove dikin. Rewşa me ya îro gotina şoreşgerên navneteweyî ya bi rengê "riya şoreş bi çol û çiv e" diçespîne. Kesên ku serkeftineke bi hêsânî hêvî dikirin an hê jî dikin, dibe ji aliyê derûnî ve têk biçin. Lewre li holê serkeftineke hêsânî û çareserî xuya nake û bi çolbirî rêgirtin ne pêkan e.

Rast e, kêşeya kurd ketiye rojeva cihanê. Ev yek jî ji bo tevgera kurd gaveke mezin e. Her wiha dewleta tirk her ku diçe ji cihanê dûr dikeve ango dikeve rew-

şa Afrîkaya Başûr a serdema rejîma regezperest. Lê rastiyêke din jî heye; ji bo çareseriyê du alî hene, her wekî çawa bêyî erêkirina PKK çareserî nabe, bêyî erêkirina dewleta tirk jî riya danûstandinê venabe. Îro jî dewleta tirk jî çareseriyê dûr e. Hikûmeta ku Ecevit ava bike dê wê ji çareseriyê hîn dûr bixe.

Artêşa tirk derfeta ku di dema cuntaya leşkerî de bi dest nexistibû, îro bi dest xistiye. Generalên tirk di dema 12'yê rezbera 1980'yî gava desthilatî xist destên xwe, piraniya gel piştewaniya wan nedikir. Piştî vê jî 600 hezar kurd tirk hatin derdest kirin, îşkenceyên xedar li wan hatin kirin. Lê dîsa jî hestên şoreşgerî di nava civaka tirk de xurt bûn. Li hemberî dewletê nebe jî li hemberî faşîstên sivil reaksiyoneke mezin hebû. Lewre gel bi pêşengiya tevgera şoreşger li hemberî êrîşên faşîst li ber xwe dabû.

Îro rewş gelekî cuda ye. Tevera faşîst a sivil digel hemû parçebûna xwe jî di nava civakê de şax vedide. Partiyên rastgir ji aliyê bîr û baweriyê ve gelekî nêzî hêzên faşîst bûne, her wiha partiyên sos-

yal demokrat û îslamî jî zêde ne dîrî bîr û baweriyên regezperest in. Tevera şoreşger ya gelê tirk gelekî qels û lawaz e, bandora şovenîzmê li ser kedkaran gelekî zêde bûye. Civaka tirk di nava arîşe û gelleşeyan de dixeniye, baweriyê gel bi siyasetmedaran nemaye. Lê bawerî bi artêşê zêde dibe, tevî ku artêşê ew qas xesar daye gel jî, dîsa sazîya ku herî zêde baweriyê gel pê tê artêşa tirk e.

Biryarên 28 reşemiyê yê MGK'ê biryarên ji nû ve xwesazkirina kemalîzmê ne. Civak wekî ku salên 1930'yî vedigere xuya dike. Ev yek riya aşî û çareseriyê dirêj dike. Lê tê zanîn ku bandora vê bîrdoza dijmirovî demdemî ye. Her wiha tundîperestîya rejîmê ji ber mezinbûna sûcên wê ye. Qala 30 hezar mirovên ku di şer de hatine kuştin tê kirin, ji kuştina van mirovan derdorên şerxwaz û regezperest berpîrs in, heke niha kevîrê rejîmê ji cihê xwe bileqe, dê erdhêj di rejîmê de çêbe, lewre jî heta ji xwediyê rejîmê tê naxwazin sistî bikeve nava hîmê rejîmê. Lewre divê em jî nehêlin ku sistî bikeve nava me û xebata xwe gurtir bikin.

KT dê di dadgeha mirovahiyê de bê darizandin

Ferhengok

avşile: dims, mût	heyam: serdem (dönem)
bêhempa: bêemsal	hunermend: sanatkar
bengî: tutkun	îwer: ewk, çik (şey)
bestir: yaygi	kêlendî: tirpan
cest: laş	kirdan: tîra stûr û mezin
çêrt: pîsiya çivikan, zirç	letandin: susturmak
çilîzîn: mecazî bi tirkî otlanmak	mezîzîn: telef olma
degel: komik	nanûgenimîkirin: şelafîkirin (yağcılık)
demankirin: kiralamak	nêjîn: nihêrîn, mêzekirin
dêran: çandin	parak: kate (börek)
derdestkirin: tutuklama	pesendkirin: onaylamak
dêse: miha çiyayî	pêwîst: pêdivî, lazim
desthilatdar: serdest (egemen)	piştewîst: birlik ve beraberlik
fêrbûn: hînbûn, elimîn	qelîzîn: li keysa xwe gerîn
ferzîn: di sentrecê de wezîr	şêwe: awa, şikl (biçim)
filar: sola ku binê wê bêmix e	şûre: barût
firîfîn: pişkîna sewalan	tepres: hilekar, fêlbaz
gazîz: kurmê hejîrê	tivir: turp totime:mêrê girs û dirêj
gazûz: güve	vegotin: dikirandin (anlatmak)
genûs: çikûs, tama	xongîn: xunivîn (çiseleme)
gêrûse: destar (eldeğirmeni)	ziko: çilek (obur)
gilare: kütük	zinîn: pêçîn
girûz: girnoz (pürüzlü)	
heke na: an na (yoksa)	
hêrûn: hêkerûn, qêxane (omlet)	

ADAR JIYAN

Dadgerandin rêz û rêçikên edlandina bizavên mirovan e. Ger dadgerandin çiqas guherbar û bi hin teşeyên xwe ji hev cuda be jî, bi taybetî mafê mirovên lêqewimî di parêze. An jî divê wisa be.

Du cureyên dadgerandinê hene. Yek, dadgerandina navxweyî, ya duymîn dadgerandina navneteweyî ye. Dadgerandina navxweyî li gorî rêz û pîvanên xweser ên aborî, civakî û psikolojîk ên civakan saz dibe. Kîjan hêz serdest be zagon bi destên wê û li gorî berjewendiyên tînan danîn û dadgerandineke yekalî û bêdad ava dibe. Dadgerandina navneteweyî berevajî wê, li gorî pîvanên gerdûnî û krîterên navneteweyî tê meşandin. Her çiqas derbasî jiyane nebin jî, mafên mirovan li ser kaxîzê xuya dibin. Mirov bi riya hiqûqa navneteweyî dikare doza mafên xwe yê qanûnî bike. Lê belê di dîrokê de tu mafên mirovan li gorî rêz û rêçikên dadmendiyê nehatine dayîn. Çi mafên rewa yê ku hene, bi riya têkoşînê hatine bidestxistin.

Gelê kurd, heta îro ger çî bi dest xistibe bi riya têkoşîneke bêhempa û berxwedaneke birûmet bi dest xistiye.

Pergala hiqûqa Komar Tirk, li ser bédadî û bêmafîyê ava bûye. Komara Tirk bi hemû sazî û dezgehên xwe yê nijadperest bi zorê û bi zagonên tûj li

ser piyan dimîne. Dadgeh jî sê kesan an jî hêmanên bingehîn pêk tîne. Dozger, dadger û parêzer. KT'ê jî bo gelê kurd ev her sê piyên hiqûqê birîne. Bav û bapîrên kurdan 75 sal berî îro, li dijî hêzên mêtînger, di ber bapîrên tirkî de û ji bo xaka Anatoliyê xwîna xwe wekî ava çeman herikandine ser xaka Çanakkaleyê. Komara Tirk bi xwîna wan hate damezirandin. Lê belê Dadgehên Serxwebûnê (İstiklal Mahkemeleri) bû xela-

Dadgerandina navneteweyî berevajî wê, li gorî pîvanên gerdûnî û krîterên navneteweyî tê meşandin. Her çiqas derbasî jiyane nebin jî, mafên mirovan li ser kaxîzê xuya dibin.

ta wan. Hiqûqa wan ji kîjan zagonan pêk hatibû? Dadgeh û hiqûqa navneteweyî li ku bû? Gelo cihana hişyar çima xwe li kerî û koryê danîbû? Ji ber ku dengê gelê kurd wekî îro bilind nebûbû. Kurd ji tîkiliyên diplomatîk haydar nîn bûn. Her wiha tîkiliyên xwe yê navneteweyî nekişandibûn asteke bilind û bi tîkoşîna xwe, xwe bi cihanê nedabû pejirandin. Îcar gelê kurd bi hewldaneke mezin tîkoşîneke berfireh û pîralî daye ber xwe. Li ser rûyê cihanê mirovekî/e ku ji neheqî û tawanbariya dewleta tirk haydar nîn be, nemaye. Hovîti û zilma ku bi dehan sal in li ser gelê kurd tê me-

şandin li ber çavên hemû cihana hemdem pêk tîne. Di dîroka mirovahiyê de tu tawanên bi vî rengî neqewimîne û rayedarên tu dewletê bi karên xeternak ên wiha ranebûne. Cihan jî ber van kirinên dewleta tirk şaş û metel e. Tu riyên demokratîk û aştiyane nehiştine.


Encam çî dibe bila bibe Komara Tirk îro ketiye rewşek xerab û bêçare. Tu hêz û pergalekê dadgerandinê nikarin wê ji destê mirovahiyê û lêqewimiyên şer rizgar bike. Komara Tirk bi vir li çonga xwe xistiye û çiqas tê birîna wê xedartir dibe. Sero-komarê dewleta wê rewşê pir baş bi lêv dike. Her roj wekî ferza nimêjê dibêje "Türkiye dewleta hiqûqê ye." Ger wisa be çî pêwîst e ku her roj wê yekê dubare bike?

Di van rojên dawîn de bi beşdarbûna çêlikên guran, her roj dirûşmeyên wiha têne qirandin: "Welat cuda nabe." Ma kesên ku welatê wan yekgirtî be wê dirûşmeyê diqirin? Çima ev tişt di mêjiyê wan re derbas dibe? Ji bo çî ditirsîn? Sedem ev e: Çimkî wan bingeha cudakirina gel û welêt (Türkiye) jî zû ve daniye. Bi vî parano-ya û hovîtiyê tu kes li dora xwe nehiştîye. Ma qey ew mirov in? Ma qey wan tu rê ji mirovahî û biratiyê re hiştîye? Di vî warî de ji ajalên daristanan paşverûtir in. Hiqûqa Komara Tirk ji zagonên kevneperest pêk hatiye. Komara tirk û rayedarên wê yê tawanbar dê rojekê di dadgeha mirovahiyê de werine darizandin.

Berpirsên partî û rêxistinên demokratîk ên li Tirkiyeyê:

Divê riya çareseriya kêşeya kurd vebe


Serokê Giştî yê SIP'ê Aydemir Güler jî bi awayekî xwerexneyî nêzikî di meseleyê de da û wiha got: "Berî ku êrîş pêk bîn, me dikaribû bîr biba. Mixabin di nav çepê tirk te nîjadperest hene. Ew li dijî tevgera kurdan in jî." Güler di berdewama daxuyaniya xwe de da xuyakirin ku helwesta girseya kurd a bo bédengiya wan di cih de ye. Wî, diyar kir ku wan di vê pêvajoyê de piştgiya kurdan nekiriye.




Akın Birdal



Siyami Erdem



Aydemir Güler



Refik Karakoç

Piştî ku Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan çû Romayê, kurd di rojê cihanê de bi awayekî berfireh bûn sermijar. Li aliyê din Kurdistanîyan ji bo çareseriya kêşeya kurd bi rojan çalakîyên domandin û niha jî didomînin. Li hemberî vê yekê derdora faşîst û hêzên dewletê êrîşê birin ser sazîyên kurdan. Lê li hemberî wan êrîşan reaksiyoneke watedar ne ji aliyê îslamiyan ne jî ji aliyê çepgiryan ve hate nîşandayîn. Li ser yê yekê em bi Serokê Giştî yê İHD'ê Akın Birdal, Serokê Giştî yê KESK'ê Siyami Erdem, Serokê Giştî yê Mazlum-Der'ê Yılmaz Ensarioğlu, Serokê Giştî yê DBP'ê Refik Karakoç, Serokê Giştî yê SIP'ê Aydemir Güler û Serokê Giştî yê ÇHD'ê Aydın Erdoğan re axivîn.

Di navbera hêzan de yekîtiyê pêwîst e

Yılmaz Ensarioğlu da zanîn ku divê di vê pêvajoyê de di navbera hêzên muxalîf de yekîtiyê pêk bibe. Her wiha Ensarioğlu li ser sîstema dewleta tirk jî rawestîya û diyar kir ku ev bi salan e ev sîstem li ber rêxistîbûna gel asteng e. Li gorî wî, vê sîstemê her dem mirov çewsandine. Ji ber wê yekê jî kesê ku ji xwe re gotiye 'ez muxalîf im' di bin bandora dewletê de maye û ji gotina dewletê derketiye. Her wiha Ensarioğlu got ku dema ev bédengî bidome ne tenê kurd wê hinek aliyên ku wekî hedef hatine nîşandayîn ji zîyanê bibînin.

Serokê Giştî yê DBP'ê Refik Karakoç jî li ser berpirsiya hêzên muxalîf rawestîya û diyar kir ku ji vir û pê de ji bo çareseriya kêşeya kurd û demokratîk barê hêzên muxalîf girantir bûye. Wî, da zanîn ku hêzên muxalîf di çerçoveya programekê de dikarin di nav xwe de yekîtiyê saz bikin. Li gorî wî, encax

bi vî awayî ew dikarin moralê bidin gel û piştî vê dikarin piştgiyê ji hundir û ji derve bigirin. Karakoç gotina xwe wiha domand: "Ji bo çareseriyê heta niha firsendeke bi vî rengî neketibû destê me. Çi fêde dewletê hê jî kêşeya kurd napejirîne û hemû dengên muxalîf diçewîsîne. Lewre jî ew li muhataban nagere."

Serokê Giştî yê KESK'ê Siyami Erdem jî di daxuyaniya xwe de diyar kir ku problemên herî mezin di warê civakî, aborî û siyasî de ne. Li gorî wî, ev yek jî di encama kêşeya kurd te derketine. Wî da zanîn ku çareseriya kêşeya kurd dê ji bo demokratîkbûn û sivilbûna Tirkiyeyê gaweke mezin be. Her wiha Erdem tevî gîlî û gazincên xwe got ku wan di destpêka pêvajoya İtalyayê de daxuyaniyê çapemeniyê daye û ji bo rawestîna li dijî şovîzîm û êrîşên faşîst bang li hemû partiyên siyasî kiriye lê tu kesî guhê xwe nedaye wan.

Serokê Giştî yê ÇHD'ê Aydın Erdoğan jî bo çareseriya kêşeya kurd da zanîn ku divê pêşîn rê li ber nîqaşan were vekirin. Dema bingeha vê yekê neyê çêkirin, çareserî pêk nayê.

Serokê Giştî yê SIP'ê Aydemir Güler jî bi awayekî xwerexneyî nêzikî di meseleyê de da û wiha got: "Berî ku êrîş pêk bîn, me dikaribû bîr biba. Mixabin di nav çepê tirk te nîjadperest hene. Ew li dijî tevgera kurdan in jî." Güler di berdewama daxuyaniya xwe de da xuyakirin ku helwesta girseya kurd a bo bédengiya wan di cih de ye. Wî, diyar kir ku wan di vê pêvajoyê de piştgiya kurdan nekiriye. Her wiha Güler wiha got: "Em di vê pêvajoya dijwar de tê gihîştin ku, pêşeroja van gelan girêdayî hev e. Jixwe em û HADEP'î di nav hev de ne."

AZAD ALTUN

□ **Akın Birdal:** Kêşeya kurd a riya demokratîkî jî veke

Divê tu kes xwe ji ber çareseriya kêşeya kurd û demokratîk nede paş. Eger dê pêşîya demokratîkbûnê vebe, çareseriya kêşeya kurd firsendek e. Rêxistinên civakî yên sivil jî kêşeya xwe divê di çareseriya kêşeya kurd de bibînin. Polîtîkaya dewletê ya bo çareseriya kêşeya kurd nîn e. Bila gelê kurd muhatabê xwe çêke. Ev pêncî sal in ku Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan hatiye pejiwandin. Ev ji bo gelên cihanê bo bikaranîna maf û azadiyên xwe fersendek e. Divê Tirkiye jî vê firsende bi kar bîne."

□ **Siyami Erdem:** Divê heb na kurdan bigeribin

Dewlet di warê muhatap de, polîtîkaya xwe ya berê diparêze. Dewletê mecbûr bimîne ku nêziktedayîna xwe ya bo kurdan biguherîne. Ji ber ku ew nêziktedayîna hebûna kurdan red dike. Li Tirkiyeyê jîyan pirdeng e, lewre divê nêziktedayîna dewletê jî, qanûna bingehîn jî pirdeng û pîreng be. Divê hebûna kurdan li Tirkiyeyê bê qebûl kirin."

□ **Yılmaz Ensarioğlu:** Helwesta hinek îslamiyan ne der bîrdoza fermî ye

Ez dibêjim polîtîkaya dewletê ya bo çareseriya kêşeya kurd ne hêjayî nîqaşê ye. Ji ber ku kesên desthilatdar hê hebûna kêşeyê napejirînin. Lewra em jî nizanin ku wekî muhatapê kê nêzikê xwe bibînin. Hê jî dibêjin kêşeya

ke terorê ye. Wekî çareserî jî rêbazên mîlîtarîst bi kar tînin.

Rast e. Bi awayekî giştî di hinek îslamiyan de nêziktedayîna bo çareseriya kêşeya kurd ji îdeolojiya fermî ne cûda ye. Di vî warî de tesîra rêveberên çapemeniya îslamî û berpirsiyarên rêxistinên girseyî heye. Ji aliyê din ve hêmana herî girîng rawestîyên ku dibêjin em nûnerên kurdan in û organên weşanên wan û rêxistinên girseyî yên sivil, para wan di vê kêşeyê de heye. Di vî warî jî hev ne haydarbûn jî di kêşeyan de xwedî tesîreke mezin e."

□ **Aydemir Güler:** Em çareseriya bi tevgera kurdan re dixwazin

Di van 15 salên dawîn de tevgera kurd xwe guhart. Êdî cemawera kurd ya li Tirkiyeyê ne gundî û paşverû ye. Piraniya wan li metropolên mezin in. Bi karkerên tirk re di nav hev de ne. Ev berhema 15 salan e. Ji vir û pê ve divê pêşniyazên bo tevgera kurd ango kêşeya kurd li gorî vî rastiyê bin.

Tevgera kurd bi gavên xwe dikare dîroka me biguherîne. Ew dixwazin kêşeyê di nav sînora xwe de lê ne bi tevgera kurd ku şoreşger re çareser bikin. Artêş jî xwedî çareseriyekê ye lê xwedî çareseriyê jî holê rakirinê ye.

Ew dibêjin em PKK'ê Abdullah Öcalan muhatap nabînin. Ev ne bes e. Piştî vî çî perspektîfa dewletê heye. Zelaliyê nîn e. Bi tenê dibêjin em faktora herî mezin ji holê rakin, dî re wê mesele çareser bibe. Niha erdnîgariya tevgera kurd diyar e. Hev kêşeya navxweyî jî diyar e. Dema ev hev kêşeya li ber çav neyên girtin, çareserî jî wê ne rastîqînî bin.

PKK berî vê bi 20 salan ava bû: “Me digot qey ew dîn in”

“Gava hatibûn mala me hema diketin hundir û derdiketin derve. Dûre ketin hundir û hebû 14-15 saet derneketin derve. Gava derketin derve rûyê wan geş bû, hema dikenyan, hev hambêz dikirin û hev maçî dikirin. Ez dibêjim qey baskê wan hebûna wê bifiriyana. Wê demê min digot qey kurê min Seyfettin dîn bûye.”

Wekî hebên baranê ji bo şinkirina jiyane, hêdî hêdî û bêdeng ketibûn nava Amedê. Wan nedixwest kes wan bibîne, tenê dixwest dilê kurdan bi awayekî kûr û bi girêdana xurt wan hîs bike.

Li erebeyên cuda siwar bûn û ber bi Licê ve herikîn. Gihiştin Gundê Fîsê. Wan zêde wext derbas nekir. Lewre karê wan pir bû û li pêşiya wan pêvajoyeke demdirêj û zor hebû. Diviya ev civîn li gorî dilê wan bi dawî bibûya. Lewre ji xeynî kêmasiyekê li gorî dilê wan bi dawî bû.

Amadehiyên xwe berî civinê li Amedê temam kiribûn. Ji bo civinê Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan û Mazlum Doğan Gundê Fîsê bijartibû. Wan dest bi civinê kir. Civinê bi tevîbûna 20-25 kesan dest pê kiribû. Kesên ku

meha sermawezê bû. Nesekinîn. Di he-man demê de civîna xwe dane destpêkirin. Lewre civîneke dîrokî bû û wan nedixwest ku ev gava dîrokî dereng bimîne. Her wiha Serokê PKK'ê û kadroyên PKK'ê soz dabûn ku layiqî şehadeta Haki Karer bibin. Civinê wekî her gav bi rêzgirtinê dest pê kir û bi hilbijartina dîwanê domiya. Ji bo birêvebirinê M.Hayri Durmuş hate hilbijartin.

Civîna avakirinê

Di bin rêveberiya M. Hayri Durmuş de civîn du rojan domiya. Di civinê de ji bo Komîteya Navendî hin kes hatin pêşniyazkirin û dûre hatin hilbijartin. Gava Mazlum Doğan hate pêşniyazkirin, wî wiha got: “Ez xwe pêşniyaz nakim, lê heval çi karî bidin ber min ez ê bipejirînim.” Dûre, Şahin Dönmez rabû

met Karasungur bûn. Van sê kesan wê piştî demekê civîneke din li dar bixista û Komîteya Navendî hilbijarta. Lî dûv xelasbûna civinê kadroyan berê xwe dan Öcalan. Yekî pirsî: “Em ê civîna xwe ya duyemîn kengê li dar bixin.” Abdullah Öcalan bi fikirîn û dilşadî wiha bersiv da: “Hevalno, heta kongreyeke din an em ê bi ser bikevin, yan em ê têk biçin!” Piştî vê axaftina Öcalan heval ji odayê derketin derve.

“Min digot qey Seyfettin dîn min dîn bû ye”


Diya Seyfettin Zoğurlu, Raziye Zoğurlu rewşa PKK'iyî a piştî civinê, wiha tîne ser zimên: “Gava hatibûn mala me hema diketin hundir û derdiketin derve. Dûre ketin hundir û hebû 14-15 saet derneketin derve. Gava derketin derve rûyê wan geş bû, hema dikenyan, hev hambêz dikirin û hev maçî dikirin. Ez dibêjim qey baskê wan hebûna wê bifiriyana. Wê demê min digot qey kurê min Seyfettin dîn bûye.”

Erê partî hatibû avakirin lê partiyeke bînav bû. Li ser gelek navan nîqaş çêbûn. Dawiya dawîn ji Partiya Karkerên Vietnamê sîd hate wergirtin û wan got: “Bila navê partiya me jî partiya karkeran be.” Ji bo vê yekê jî Ferhat Kurtay hate peywirdarkirin. Lewre Ferhat Kurtay gelekî baş bi kurdî dizaniya.

Rêveberiya Navendî li dû hinek xebatên xwe, civîna duyemîn da destpêkirin. Di vê civinê de ji bo Komîteya Navendî Abdullah Öcalan, Cemil Bayık, Şahin Dönmez, M.Hayri Durmuş, Mazlum Doğan, Mehmet Karasungur, Baki Karer hatin hilbijartin. Vê komîteyê di nava xwe de di du - sê beşan de karbeşî saz kir.

Karê Rêvebirina Navendî ji Şahin Dönmez, M.Hayri Durmuş, Baki Karer pêk dihat. Peywira Birêvebirina Navendî ev bû: Dê karê birêxistinê bimeşanda û li cihê ku gel birêxistin bû jî dê karê birêxistinê xurt bikira.

Di bin rêveberiya M. Doğan de Lijneya Nivîsê Ya Navendî (Merkezi Ya-



tevî civinê bûn ev kes bûn: “Abdullah Öcalan, M. Hayri Durmuş, Mazlum Doğan, Cemil Bayık, A.Haydar Kaytan, Şahin Dönmez, Resul Altıok, Ali Gündüz, Mehmet Turan, Kesire Yıldırım, Sakine Cansız, Duran Kalkan, Seyfettin Zoğurlu, Baki Karer, Ali Çetiner, Mehmet Şener. Mehmet Karasungur ji ber ku bi Süleymaniyan re di şer de bûn û Kemal Pir jî ji ber ku di girtîgehê de bû tevî civinê nebûn. Dema M. Can Yüce qala civîna navborî û rola Abdullah Öcalan dike, fikra xwe wiha tîne zimên: “Serokatî berêde tek-bû, tek ma û tek hiştin.”

Gava ew gihiştin gundê Fîsê 25'ê

û ji bo Komîteya Navendî xwe pêşniyaz kir. Bi pêşniyaza Şahin Dönmez rengê civinê guherî.

Li ser vê yekê M. Can Yüce wiha dibêje: “Serokatîyê pê dizanibû. Jê bawer nedikir. Lê dîsa jî ji bo ku xwe biguhere her gav piştgiriya hevriyê didayê.” Li ser xwepêşniyazkirina Şahin Dönmez tişteke neguherî. Êdî xwe pêşniyaz kiribû. Ji ber ku pêşniyaz hatibû û maf nîn bû ku pêşniyaz bi paş ve bihata kişandin. Civîn di 27ê sermawezê de bi dawî bû.

Di civinê de ji bo rêvebirina navendî sê kes hatin hilbijartin Ev kes: Abdullah Öcalan, Şahin Dönmez û Meh-

zî Kurulu) hate sazkirin. Ev li jine ji Mazlum Doğan, Kesire Yıldırım û Duran Kalkan pêk dihat. Karê ve li jineyê birêvebirin û şopandina kar û barên îdeolojîk bû. Her wiha ve li jineyê wê kovarek jî derbixista.

Ev herdu li jine girêdayî Komîteya Navendî bûn û di xebatên xwe yên rojane de wê bi Rêveberiya Navendî re di têkiliyê de bûna.

Her wiha Mehmet Karasungur ji bo xebatên leşkerî hate peywirdarkirin. Cemil Bayık jî ji bo xebatên birêvebirina navendî û karê aboriyê hate peywirdarkirin.

Piştî bidawîbûna civinê, PKK'iyî lezdan xebatên xwe. Sal 1979 bû. Ji bo bîranîna Haki Karer çalakîya afîşdaliqandinê hate lidarxistin. Di vê çalakîyê de Halil Çavgun hate qetilkirin. Li ser vê û li gorî karên ku endamên PKK'ê girtibûn ser milê xwe di gulana sala 1979'an de li Dilûkê Kovara Serxwebûnê dest bi weşanê. Di berga kovare de wêneyên Haki Karer û Halil Çavgun hebûn û ji bo bîranîna herduyan kovar serdanpê ji bo nivîsên der barê wan de hatibû veqetandin. Ev kovar berî Derbeya 12'ê Rezberê bi qasî çar hejmar derket in. Bi derbeyê re weşana ve kovarê hate sekinandin. (Qediya)

AMADEKAR: CEMİL ANDOK
Çavkanî: Dirilişin Öyküsü (Zagros Yayınları)

Diriliş Baraşarlıdı Sıra Kurtuluştā (Güneş Ülkesi Yayıncılık)

M. Can Yüce (Ülkede Gündem 27 sermawez 1997)

Rêzimanê kurmancî

- Wane 40 -

SAMÎ BERBANG

Têgihên rêzimanî

Hokerên demê: zaman bildiren zarflar

Hokerên cih û bergehê: yön ve yer belirten zarflar

Hokerên pirsiyarî: soru zarfları

Hokerên mêjerî: miktar belirten zarflar

Ji bo diyarkirin hoker, hokerên pirsiyarî ji mirov re dibin alîkar. Her yek ji wan hokeran pirsî cure-yeke hokerê dike. Divê mirov wan pirsan arasteyî lêkerê bike.

Tîpên girdek: büyük harf

Tîpên hûrdek: küçük harf

Di elfabeya latîni de tîp dibin du cure, hinek ji wan hûr in, hinek jî girs tîpê nivîsandin. Hevok bi tîpa girdek dest pê dike û bi tîpên hûrdek didome. Her wiha kurtnivîsa peyvekê jî bi tîpên mezin tîpê nivîsandin. Dîsa di nava hevokê de heke yek bixwaze balê bişîne ser kesekî navê wî tiştî mezin tîpê nivîsandin. Di alfabe ya erebî de ev cudatî nîn e.

Tîpên kelijandinê: kaynaştırma harfleri

Tîpa dubare: şedde

Darijtina peyvan: sözcüklerin türetilmesi

Peyva guherbar: değişken sözcük

Peyva neguherbar: değişken olmayan sözcük

Di kurdî de hinek beşên hevokê di nava hevokê de diguherin, hinek jî naguherin. Di nava hevokê de li gorî peywira digire ser xwe peyv hin qertafan digire an jî hin tîpên wê cihê xwe ji hinekên din re dihêlin. Ji vê yekê re guherbarî tê gotin.

Dengdêrên kurt: kısa ünlüler

Dengdêrên dirêj: uzun ünlüler

Di kurdî de dengdêrên kurt û dirêj ji hev cuda ne, wekî hinek zimanên din bi hin nîşaneyên naguherin. Di nava peyvê de kurtî û dirêjîya wan diyar e. Di hin zimanan de ew rewş cuda ye. Bo nimûne di erebî de dengdêrên kurt bi tîpekê nayên nîşandayîn, bi hin nîşaneyên ku datînin ber dengdarê tîpê nîmanî.

Dengdarên hişk: sert sessizler

Dengdarên nerm: yumuşak sessizler

Cîderk (jêderk) a deng: sesin çıkış yeri

Her wekî ji peyvê jî diyar e, bi vê

têgihê cihê ku deng jê derdikeve tîpê nîşandayîn.

Erênî: olumlu (pozitif)

Neyinî: olumsuz (negatif)

Qertafên neyiniyê: olumsuzluk ekleri

Peyv dema qertafeke neyinî bigirin dibin neyinî, dema jî van qertafan yekê jî negirin, erênî ne.

Rader: mastar

Dirûvê lêkeran ên ku mirov dikare wan wekî navdêran bi kar bîne re rader tê gotin. Tirk "masder" a erebî bi kar tînin. Di îngilîzî de "infinitive" tê gotin.

Dengsazî: fonetik

Peyvsazî: morfolojî

Hevoksazî: sözdizimi (syntax)

Raya lêkerê: fiil kökü

Raya dema niha: şimdiki zaman kökü

Raya dema borî: geçmiş zaman kökü

Avaniya lêkeran: fiil çatısı

Avaniya dançêker: ettirgen çatı

Di kovara kurmancî de ji bo vê têgihê "sedemkar" hatiye bikaranîn. Di zimanê îngilîzî de jê re "causative" tê gotin.

Kişandina lêkerê: fiil çekimi

Navdêr: İsim

Hevenav: cins isim

Serenav: özel isim

Komenav: grub ismi

Navên razber: soyut isim

Navên şênber: somut isim

Navdêrên xwerû: sade isim

Navdêrên hevedudanî: birleşik isim

Navdêrên pêkhatî: türetilmiş isim

Zayenda navdêran: isimlerin cinsiyeti

Navdêrên nêr: eril isimler

Navdêrên mê: dişî isimler

Navdêrên nêtar: nötr isimler

Mêjera navdêran: isimlerin miktarı

Daçek: edat

Daçekên xwerû: sade edatlar

Daçekên hevedudanî: birleşik edatlar

Pêşdaçek: önedat

Paşdaçek: sonedat

Daçekên neyinî: olumsuz edatlar

Daçekên sedemî: nedensellik edatları

Daçekên dubare: tekrarlanan edatlar

Gihanek: bağlaç

Baneşan: ünlem

Qertafên baneşanî: seslenme ekleri

Tengaviya Ewrûpayê

NEJDET BULDAN



Çend sal in me tiştê digot rayedarên Ewrûpayê; siyasetmedarên wan, saziyên sivil û hemû raya giştî ya Ewrûpayê. Gotin û argûmanên me ev bûn:

"Bi Peymana Lozanê we Kurdistan kir çar parçê; da destê dagirkerên xwînwar û barbar. Hûn bi vê çendê jî nesekînin, we bi awayê siyasî û çekarî harîkariya dagirkeran kir. Gelek mirovên me ji ber zilma tirkan revîyan, gund û bajar hatin şewitandin û valakirin. Heke hûn nexwazin em koçber bibin, bîr welatê we, fermo bi siyasî pirs-girînga kurd çareser bikin. Em bi şer û siyasetê û hûn bi siyasetê. Heya ku kêşeya kurd çareser nebe ji bo Tirkiye û Rojhilata Navîn rihetî û aşî pêk nayê."

Niha Ewrûpa, bi piranî jî Almanya û Îtalya di nava rewşê giran de ne. (Lê pêwîst e ku mirov di nav wê rewşê de dilxwaziya Îtalyayê ji bîr neke. Bi rastî jî ew dixwazin pirsî kurd û ya Öcalan çareser bikin.) Ew jî ketine tengaviyê mezin. Çend riyên eşkera li pêşîya wan in: Almaniyayê

eşkera kir ku Öcalan naxwaze welatê xwe ji bo darizandinê. Lê ji bo çareserkirina meseleya kurdan jî bi fermî arîkariya Îtalyayê dike. Ji bo dadgeheke navneteweyî (ji bo Öcalan) amade ye. Dadgeheke navneteweyî ya ku li ser rewşa Öcalan tê pêşniyazkirin, tu caran pêk nehatiye, qala Laheyê bête kirin jî cihan dizane ku ew dadgeha sêdarên şer e. Rewşa Öcalan ne ya dadgeha Laheyê ye. Pêwîst e ku dadgeheke navneteweyî û awarte were avakirin. Wê demê meseleya kurdên Bakur dikeve nav nîqaşê fermî. Hingî dewleta tirk jî dê bête darizandin.

Dewleta tirk dem û dest nerazîbûna xwe eşkera kir. Du sedemên girîng ên dewleta tirk hene: Yek, dewlet dikeve rêza Öcalan. Du, pirs-girînga kurd ê bikeve rojeva saziyên navneteweyî û fermî dibê.

Heke penaberîya Öcalan bê pejirandin, navbera wê û tirkan tam xirab dibê. Pejirandina Öcalan, ne tenê bo Îtalyayê ye. Hingî ew wekî hemwelatîyê Yekîtiya Ewrûpayê li hemû deveran azad e. Ev jî ji bo dewleta tirk mirin e.

Dibe ku ji ber hemû astengan Îtalya bixwaze Öcalan careke din bide Rûsyayê. Li gorî zagonên navneteweyî kesên ku bi qaçaxî bikevin welatê, mafê wî welatî heye ku wî bi paş ve bişîne. Lê pejirandina Rûsyayê gumaneke gelekî lawaz e. Dema ev

nivîs dihate nivîsîn Wezîrê Karê Derve yê Îtalyayê Lamberto Dini li Rûsyayê bû. Çûyîna Dini ji bo Rûsyayê du gumanan tîne bîra mirov: Yek, ji bo paşverêkirina Öcalan e. Du, ji bo konferanseke navneteweyî ya kurdan arîkarî xwestin e. Hêviya me ew ku xala duyemîn pêk were.

Gumanek jî ev e ku Ewrûpa rewşa kurdan û Öcalan li dijî Tirkiyeyê bi kar bîne. Ne ji bo aborî, ji bo siyasetê da ku Tirkiye xwe ji bo Yekîtiya Ewrûpayê amade bike. Di vê xalê de pêwîst e ku mirov bandora Amerîkayê jî ji bîr neke. Dema Ewrûpa giraniya xwe deyne ser vê meseleyê, DYA jî mecbûr dimîne ku siyaseta xwe ya li hemberî PKK'ê di ber çavan re derbas bike. Wê demê yan Amerîka û Ewrûpa lêk tîne, meseleya kurd bi riyeke siyasî çareser dibê. Yan jî li ser rewşa kurdan û Tirkiyeyê sarî dikeve navbera Amerîka û Yekîtiya Ewrûpayê. Pêwîst e ku kurd ji bîr nekin ku heke em bi hêz bibin çareserî ne dîr e. Bêguman Ewrûpa û Amerîka dê hindêk rêbazên nû jî deynine ber tîkoşîna kurdan.

Dibe ku li gorî hemû mercên xirab û astengiyên Îtalya bibêje Öcalan 'ji welatê min derkeve'. Ew jî ji bo Öcalan û kurdan rewşê gelekî xirab e. Kurtiya wê, pêvajoyeke gelekî dijwar e; ji bo kurdan, dewleta tirk û Îtalyayê.

Têkoşerê mezin yê înternasyonalîst:

Ersin Yıldız

Ersin Yıldız, berî Darbeya 12 Rezberê di nav çepgirên Tirkîyeyê de ref digire lê piştî darbeyê xwe jî têkoşînê dide alî û dispêre alkolê. Li salên 90'î Tevgera Azadîxwaz nas dike. Yıldız, tevî astengiyên lêzimên xwe jî, ji dil û can bo doza Kurdistanê xebatê dike.

Peydabûna dîroka PKK'ê bi tîra xwe balkêş û hêjayî lêkolandinê ye. Lewre di serdema peydabûna PKK'ê de mirovahiye hêviya xwe jî "sosyalîzmê" qut kiribû û kêr û zêde her kesî xwe spartibû împeryalîzmê. Bi awayekî din her kesî dida ber dilê împeryalîzmê û bi rola qeşmeriya împeryalîzmê radibû. PKK di vê dema dijwar de rabû. Ew, bes ne bo gelên Kurdistanê bo gelên herêmê jî bû rêberê pêşerojê azad û serbixwe. Loma jî gelên din ên herêmê jî gelek têkoşeran di nava refên têkoşînê doza azadî û sosyalîzmê kir.

Ji wan têkoşeran yek jî înternasyonalîstê hêja Hevalê Ersin Yıldız e. Wî, tim behsa giranbihahiya îdeolojiya PKK'ê dikir û bêdudil wisa digot: "Min bi saya PKK'ê xwe jî qirêjiyên sîstemê şûst."

Hevalê Ersin li sala 1964'an li Agiriyê li navçeya Avkevîrê (Taşlıçayê) jî dayik dibe. Di heşt saliya xwe de ligel bavê xwe berê xwe dide Almaniyayê. Lê li wî welatî sebra wî nayê lewre her tim bêriya surîştê welêt û dilgermiya mirovên wê dike. Ji ber vê yekê vegera bo welat dide ber bavê xwe. Ew, li ser vê daxwaza xwe pîkolyê dike û dawiyê di sala 1979'an tê li îzmîrê, li cem lêzimên xwe bi cih dibe. Vê demê bi rêxistinên çepgir re tîkiliyan datîne û van tîkiliyan heya Darbeya 12 Rezberê didomîne. Piştî darbeyê ew jî wekî gelek kesan xwe dide alî. Lê gir û hêrsa

wî ya li dijî dewletê venamire. Dawiyê tî Stenbolê û li cem birayê xwe, ku jî Almaniyayê vegeriya, dest bi veguhêzkariyê (nakliyatçılık) dike. Vê demê jî ber çewsandin û terora dewletê, nikare kel û hêrsa xwe ya li dijî dewletê bi der bike, lewre xwe dispêre meyê (alkolê). Demeke dirêj bi vî awayî jiyana xwe didomîne.

Dema xebata li Özgür Ülkeyê

Wekî gelek kesan, germahiya têkoşîna salên 1990'î bandorê li Hevalê Ersin jî dike. Hevalên wî yên kurd, ku berê xwedî kesayetiyeke şkestî û binkefî ne, bi bandora têkoşînê li xwe vedigerin û jiyaneke şoreşgerî didomînin. Ev yek, dike ku Hevalê Ersin jî li rewşa xwe bifikire. Piştî vê yekê Hevalê Ersin li rewşa kurdan dikole û li ser gerîla pirsan jî derdora xwe dike. Li ser vê yekê dilê wî bêhtir bi kurdan germ dibe û berevajî lêzimên xwe hurmeteke mezin nişanî kurdan dide. Di vê serdemê de rewşa kurdên ku jî ber zilm û zora dewletê berê xwe didin metropolan, tesîrekeke mezin li Hevalê Ersin dike. Ji ber vê yekê gir û hêrsa wî ya li dijî dewletê gurtir dibe. Piştî vê yekê Hevalê Ersin zêdetir li têkoşînê germ dibe. Lewre weşanên şoreşger peyda dike û bi dilgermî dixwîne. Li ser vê zanabûnê, ew jiyana xwe jî nû ve saz dike û hêdî hêdî xwe jî taybetiyên sîs-



Özgür Ülke, roja 4'ê berfanbara li sala 1994'an bi fermana Serokwezîra wê demê Tansu Çillerê hate bombekirin. Ev yek jî aliyê kesên wekî Necdet Menzir û Oktay Ekşi ve hate pesendkirin. Ersin Yıldız, di encama vê êrişê de jiyana xwe jî dest da.

temê dişo. Rabûn û rûniştina wî diguhere. Ev yek bala malbata wî jî dikşîne. Lewre ew lê dixebite ku malbata xwe jî bikşîne nav refên şoreşê. Lê ew û birayê wî yê faşîst li hev nakin.

Tevî rêlibergirtina birayê wî, Hevalê Ersin birayê xwe digire û bi şeweyekî çalak di nava refên şoreşê de tê dikoşe. Cara pêşîn di nava komîsyona ciwanan ya navçeya Gaziosmanpaşa ya DEP'ê de xebata şoreşgerî dimeşîne. Di vê demê de sazûmankariya xwepêşandan û şahiyên Newrozê yên li Stenbolê dike. Ev helwesta wî, dike ku birayê wî jî binî ve rûyê xwe jî Hevalê Ersin bade. Li ser vê yekê ew jî tîkiliya xwe bi wan re sist dike. Lewre ew bi xebata bo têkoşîna neteweyî û demokratîk ya kurdan bextewar û dilgeş e.

Di jiyana şoreşgerî ya Hevalê Ersin de qonaxa duyem xebata li rojnâmeya Özgür Ülke ye. Ew, bi dil û can ajotkariya rojnâme yê dike. Lewre her çend bi şev û roj bêwestan û rawestan kar dike jî naweste. Ji ber ku ew tîgihîştîye ku bo mirovahî û gelan tê dikoşe. Êdî li ba wî tekane sedema jiyane Têkoşîna bo Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê ye. Ew, bi çavê serê xwe hevaltî û dilgermiya li nav refên têkoşînê dibîne û loma jî bi dilsozî têkoşîna xwe didomîne. Li aliyê din hestên wî yên înternasyonalîst jî peyda dibin. Ji ber ku dibîne, gelê kurd tevî hemû zordarî û çewsandinê jî dijminatîya gelê tirk nake. Lewre wî jî pê dizanî; rizgariya gelê kurd rizgariya gelên herêmê jî bû.


"Ez bi Ersinê xwe gelekî serbilind im"

Wekî xuya ye li sala 1994'an dewleta tirk bi her awayî berê xwe dabû Têkoşîna Rizgariya Kurdistanê û her tiştê tîkilî kurdan diçewsand. Rojnâmeya Özgür Ülkeyê jî ji van êriş û hovitiyan bêpar nema. Roja 4'ê berfanbarê sala 1994'an bi fermana MGK'ê dengê Özgür Ülkeyê hate birîn. Di encama vê êrişa bêhempa de 23 xebatkarê rojnâme yê birîndar bûn lê birîna Hevalê Ersin xedartir bû. Berî ku jiyana xwe jî dest bide, bo hevalên xwe wiha dibêje: "Hevalno! Divê em li ber xwe bidin û weşana rojnâme yê bidomînin!"

Şehadeta Hevalê Ersin bandoreke mezin li gelên din ên Stenbolê dike û lewre termê wî bi xwepêşandêke girseyî tê hilanîn. Darbesta wî bi ala kesk û sor û zer hate xemilandin. Bavê Hevalê Ersin darbesta wî da ser milê xwe û bi kurdî zêmar (ağıt) gotin. Bavê wî di axaftina xwe de jî wiha got: "Ev bo min roja herî pîroz e. Lewre ez gelekî pê serbilind im ku Ersinê min bo doza Kurdistanê şehîd ketiye." Peyre wî her du tiliyên xwe hilgirtin û nişaneya serkeftinê kir.

Rêwitiya Hevalê Ersin li Agiriyê dest pê kir, li Mûnih, İzmir û Stenbolê dom kir lê dawiyê bû rêwiyê doza azadî û mirovahiyê.

Têbinî: Ev nivîs ji tirkî bo kurdî hate wergerandin. Nivîs, ji kovara *Ehmedê Xanê*, ku li girtûgehê tê weşandin, hate wergirtin.



Heval Ronî

*Lo Melezzîr tu wêran î lê Kêranlix tu xopan î
Me da me we Ronahiyê çavan we çan Ava Reş lê anî*

*Hatî qîra bazê çiyar ev bi heybet rabûm piyan
Go; ez êdî nemir merd im gerden azad im li jiyar*

*Bûn yek dil hîv û roj xweza stêr berbangê me za
Şev çû bû roj roj bû Ronî za lehengê jîr û beza
Stêrek berbangê heye ew heval Ronî bi xwe ye
Her şev radîbim silavê lew mizgîna roja me ye*

Mîraz Ronî

Heval Ronî

Em li ber şehadeta te û şehîdên şoreşê bi hurmet serê xwe ditewînin.

JÎ MÊRSÎNÊ BIRAZIYÊN WÎ

● 08.12.1994

Mebûsên kurd hatin cezakirin

Doza Parlementerên kurd di danîşîna 8'ê berfanbara

1994'an de bi encam bû û ew hatin cezakirin.

Wekilên kurd ku di 2 yê meha adarê de li ber meclîsê bi awayekî êrişkarî hatibûn binçavkirin hinekan jê heta 15 salan ceza xwar. Ji mebûsên kurd Leyla Zana, Hatip Dicle, Selim Sadak û Orhan Doğan hê jî de girtîgehê de ne.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

● 10.12.1948

Roja Mafên Mirovan hate pejirandin.

Di 10'ê berfanbar a 1948'an de Komîsyona Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî, bi biryarekê belgeya Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan qebûl kir. Di xala 1. û 2. yan de mafên însanan wiha tê formûlekirin; Hemû însan ji aliyê mafan azad ve, xwedî hurmet, wek hev têne ser rûyê dinê û ji aliyê reng, cinsiyet, dîn, ziman, nijad, tebeqeyên civakî, fikrên siyasî û neteweyî, mulkiyet an jî ji aliyê statûya xwe, ji mafên ku di danezanê de hatine nişandan dikarin istifade sûde wergirin.

*Li Zanîngeha Azad kapîtalîzm hate nîqaşkirin:***Wê Marksîzm bi têkoşîna civakî biafire**


Li Zanîngeha Azad a Stenbolê konferansên şemiyê berdewam in. Roja 28'ê sermawezê bi navê "Dîroka kapîtalîzmê" çalakîyak hate lidarxistin. Di konferansê de perwerdekar Zanîngeha Stenbolê Zankoya Îktîsadê Çiğdem Şahin wekî axîfger beşdar bû. Mijara konferansê di heman demê de teza Çiğdem Şahin a doktorîyê bû.

Perwerdekar Şahin, di destpêkê de li ser "karbeşîya kapîtalîzmê ya li ser rûyê cihanê" rawestîya û got: "Li gorî zanîstê kîjan çîn (sinif) pîvanê karbeşîyê biafirîne berjewendiyên wê çînê zêdetir e. Ji ber ku ew çîn dewlemendiyên dinê li gorî berjewendiyên xwe dixebitîne."

Şahîn bi pîrsa "kî wê kîjan mal û xizmetan bi çî awayî bixebitîne, wê kî parve bike?" dest bi axaftina xwe kir û wiha berdewam kir: "Piştî Şerê Cihanê yê Duyemîn, li dinê sê blok hene. Ev blok împeryalîzma Amerîka - Ewropa û sosyalîzma Sovyetê ne." Li gorî Şahin Ricardo, Keynes û hemfîkrên wan, di êkolê de fikrên wan bîn dijî hev jî, di dawiyê de teorîsyenên îktîsada kapîtalîst in. Li gorî Şahin ew gişt aliyek, Marks aliyek e. Perwerdekar Şahin diyar kir ku Marks ji binî ve li dijî sistema kapîtalîst e û her wiha ew jî 'îktîsada nûjen' diparêze. Axîfger Çiğdem Şahin wiha berdewam kir: "Li gorî 'îktîsada nûjen' ku ev pîvanga bîrdoziya kapîtalîzmê ye, tekiliyên feodal ji holê rabin, Marks vê gavê wekî pêwîstiyê mezîn dinirxîne. Ev pêwîstî ji bo çînen nûjen 'proleterya û birjuwazî' derkevin holê nişan dide. Ev ji bo sistema dawîyê ku ew sosyalîzm e, şertê yekem e."

Şahîn diyar kir ku eger çînek wekî proleterya nebe, kes nikare sistema kapîtalîzmê hilweşîne.


Çiğdem Şahin bal kişand ser dîtinek e din neo-marksîzmê û got: "Ev kesê ku ji xwe re dibêjin neo-marksîst, ew anti-împeryalîst in. Lê her çiqas sembolar, nirx, zanîn û sistema Marks jî xebitandibin jî, wan Marks rexne kiriye lê wan tu sistem li dijî sistema kapîtalîzmê neafirandîye." Şahin bi vî minakê bal kişand ku di dibistana Wefa de ku ew ji aliyê neo-marksîstan ve hatibû avakirin, teoriyên Marks bi awayekî cuda dubare dikirin. Her wiha Wan, Marks wekî reformîst bi nav kiriye. Ji ber daxwaza Marks ku dibêje li welatekî feodal pêwîst e bîngeha kapîtalîzmê peyda bibe. Bi baweriya Şahin, ev dîtîni giş îdeolojîk in. Amerîka pêwîst e sermayeya xwe li ser rûyê cihanê belav bike, Ewropa



pêwîst e li hemû bazaran Amerîka serdest nebe. Şahin wiha berdewam kir: "Sovyetîstanê jî dixwest li dijî wan her du blokan, bloka sosyalîst xurt bike. Dîtînen aborî giş di bin bandora wan tîkîliyan de bi pêş dikevin. Bîngeha wan ev e." Şahin diyar kir ku her çend li ser aboriyê gelek doktrîni hene jî, yê sereke-sosyalîzm û kapîtalîzm in. Dîsa bi baweriya hîndekarên çepgir, li zanîngehên Tirkiyeyê jî sistema perwerdehiya aboriyê li gorî wan doktrînan hatiye danîn: Ger hûn sistema kapîtalîzmê biparêzin; doktorîni zû bi zû bi dest we dikeve. Lê heke hûn marksîst bin, çiqas tezên we yê hêja hebin jî hûn nikarin bi hêsanî ûnvana doktorîyê wergirin. Li gorî Şahin, di politikayên dewletê de jî di her warî de di tîkîliyan civakî de, di perwerdehiya dîrokî de ew helwest xwe dide xuyakirin.

Çiğdem Şahin bal kişand ser kapîtalîzma li Tirkiyeyê û wiha got: "Piştî ku Komara Tirk hate damezirandin, dîtîna kapîtalîzmê yan jî li gorî bîngeha dîtîna kapîtalîzmê meşîya. Ji ber ku sazûmankarê komarê, birjuwayê biçûk bû. Birjuwaya biçûk jî di destpêkê de di nav dubendiya împeryalîzm û sosyalîzma Sovyetê de ma, lê wan împeryalîzma Amerîka û Ewropayê hilbijart." Çiğdem Şahin baweriya xwe ya şexsî jî diyar kir. Li gorî wê jî bo ku adalet were ser rûyê cihanê pêwîst e tîkîlî û sistema kapîtalîzmê ji holê rabe. Ev nakokî di nav împeryalîstan de heye, wê kûr bibe û wê biteq. Şahin got "Ez bawer im marksîzm di bîngeha xwe de rastîyan diparêze. Ew bîrdoziya herî nûjen e. Ew wê li pêşerojê li ser dinê bi tîkoşîna civakî biafire."

A.WELAT /STENBOL

ÇAVDÊRÎ**Bijî yekîtiya neteweyî**

MÎRHEM YÎGÎT

Heyecan û germahîyeke nû li dar e. Ev bi derketina Serok ji Rojhilata Navîn bi her awayî bang dike, bi dengêkî berzîtir ji her carê, ez va me dibêje.

Kurd heta niha gelek caran li vir û li derên din hatine ba hev, meş û çalakîyên bi her awayî li dar xistine. Belê çalakîyên piştî 12'ê meha sermawezê xwediyê hewa û karekerekî din in.

Sefera Serokê Neteweyî, giş sînoren nav xet û îdeolojiyên siyasî, sînoren nav perçeyan, zarava û mezheb û dînan bi temamî hilweşandin û em êdî di çalakîyan de refleks û xwepêşandaneke din dibînin. Her tişt û her lebat neteweyîtir, tevayîtir, bihevretir û jîdilucantir e. Ev nişan û delîla pêşerojê û wêbeyeke ronî û birûmet e. Gotinê jê re navê ku îro dilê me jî her roj tevayîtir lê dide, hest û hisên me Kurdistanîtir û mezintir in û êdî em dibin yekdest û yek kulm. Bijî yekîtiya neteweyî, bijî yekîtiya gelê Kurdistanê!

Kesê ji niha û pêde bêje kurd hevdu nagirin, kurd li xwe û li serokên xwe xwedî darnekevin û nikarin bibin dewlet, dê dengê wan qut bibe, yê hene dê jî ber gotinên xwe şerm bikin û ew ê bêje jî dê kes lê guhdariyê neke. Kurd îro zindû ne, bi hev re ne û dibin dil û mêjiyek! Bûyerên van her du hefteyên buhurî li Kurdistanê û li derveyî welat, lehiya li ser rîya Romayê, kampanyaya îmezeyan li bajarê Silêmaniyê, helwesta gelê me, li Rojhilata û li Başûrê Biçûk, çalakîyên li paytextên dewletên dagirker, ji Stenbol heta bi Tehranê, rabûna siyasîyên kurd di zindanan de, xweşewitandina bi dehan keç û lawên kurd û dawî çêkirina çembereke ji êgir li dora Serokê Neteweyî û slogana "Bi can bi xwîn em bi te re ne ey Serok" giş îspatên yekîtiyê bîhêz, geş û gur in. Em jî li vir şîar û diruşma gelê Kurd "Bi can bi xwîn em bi te re ne ey Serok" dubare dikin û pê re vê dibêjin: Ey gelê Kurd em jî ji te re soz didin ku em dê berjewendiyên te di ser her tiştî re bigirin, em dê heta bi dilopa dawî ya xwîn û xwêdana xwe di xizmeta te de bin. Kesê xwe bide paş, dirixî û diduliyên bike, bila namerd be, şermazar û serdiberde be!

Derketina Serok ji Rojhilata Navîn û daketina wî li Romayê, miladeke nû ye. Berê me dikeve aliyekî bixêrtir. Meseleya me dibe meseleyê cihanî, dikeve rojeya Ewropayê. Careke din dê kes nikaribe ji rojevê derxe. Terror û zora dewleta tirk dê ji niha û pê de baştir bê dîtîni. Kî terorîst e û kî qurbanê terorîzmê ye, dê bi şeweyekî bêminaqeşe bê naskirin. Îmkanên ketine destên me jî yê serdema paş şerê cihanê gelekî li pêştir in. Hatina Serok ji bo aşî û diyalogê jî zemînek çêkir. Ewropa û raya ewropî jî êdî dikare dîtîni û pêşniyazên Serok bê wasite û rasterast bigire û diyalogê bide destpêkirin.

Rojên li pey me man, Serok di 7 xalan de pakêteke çareserkirina pîrgîrêka kurdî ragihand û pêşkêşî raya cihanê kir. Ragihandinê da xuyakirin bê ka aliyê kurd û Serokayetiya Neteweyî çendî ji bo aşî û diyalogê ye. Aliyê ji diyalogê û aşîyê direve, şerxwaz û terorîst e, dewleta tirk e. Helwesta dewleta tirk sebebê şer e û bi qasî gelê kurd jî bo gelê tirk û giş gelên mayî jî zererdar e. Siyaset li Tirkiyeyê xiliqîye. Hewcedarî bi siyasetmedar, partî û programên nû heye. Ev prosesa nû dê ji bo vî jî bibe alîkar.

Dawî divê em bi dengêkî bilind sipasî hukûmeta Îtalya û gelê Îtalya bikin. Wan guh neda şantaj û zexta dewleta tirk û îspat kir ku girêdayî heq û hiqûq in. Yekîtiya Erûpa jî dewlet bi dewlet piştgiyariya Îtalya dike. Helwesta Elmanya jî niha zelaltir û pozîtifîtir e. Zemanê dî jî bo kurdan û li dijî dijîmin kar dike. Rojên dijwar derbasbûn, serketin bi rê de ye!

Ev dem ji bo me pir girîng e. Kurd êdî fêrî jiyana bajarvaniyê dibin.

Tu caran wekî îro fêrî jiyana bajarvaniyê nebûbûn. Ji ber ku her dem bajarên kurdan ji aliyê xelkê ve hatine birêvebirin. Tim desthilatdar li bajarên hebûne û kultura wan hinekî xurt bûye. Lê vê gavê êdî muzîkên me yên nû jî divê hinekî bajarî bin.

Birêz Gulistan hûn dikarin di serî de serpêhatiya xwe ya hunermendiyê bo xwendevanên Azadiya Welat vebêjin?

□ Her ku ez dizanim têkiliya min bi hunerê re hebû. Ji ber ku ez di nava malbateke oldar de mezin bûm. Wekî diyar e li cem malbatên wisa hunera kurdî gelekî xurt e. Bi taybetî li malên Eşîra Şêxan a ku xwedî mirîd bû, çand û hunera kurdî gelekî xurt bû. Mirîd li odeyan li hev rûdiniştin û çî qesîde û çî tiştên din bi kurdî digotin. Li şevbuhêrkên wan li erbanê dihat xistin û ew tev bi muzîka kurdî derbas dibûn.

Lê bi piranî li malên oldar qesîde û dîlok bi zîmanê erebî tîn gotin?

□ Na. Nayê bîra min ku bi erebî hatiye gotin. Ev li aliyekî, destanên wekî Memê Alan, Zembîlfiroş û hwd. ku li Kurdistanê navdar in, di civatan de dihatin vegotin û gelekî jî bal dikişandin.

Gelo vê yekê tesîreke çawa li we kir?

□ Min ne tenê li gund her wiha li bajêr jî li destan û çîrokên kurdî guhdarî kiriye. Ez bêdudilî dikarim bêjim ev berhem şikil didine mirov. Lewre di dema zarokatiyê de muzîk gelekî girîng e. Mirov wê çaxê hez ji tiştan dike û biryara xwe dide. Bingeha hunermendiya min di wê demê de hate danîn.

Baş e. Em vegeerî ser pîrsa xwe, we bi şeweyekî profesyonel kengê û çawa dest bi hunermendiyê kir?

□ Hûn jî dizanin wê demê li Kurdistanê stranên kurdî qedexa bûn. Di ser de jî çî televîzyon çî jî radyo tu saziyên kurdan tunebûn. Hin rojnameyên bi kurdî hebûn, ew jî giş politik bûn. Bi kurtayî hunera kurdî karaktera xwe baş wernegirtibû. Dema yekî/ê bistranda xelkê jê re digot stranbêj, mitrib, alofîno û nizamim çî! Li aliyê din wê demê jineke kurd ji nava malbata Şêxan rabûya û bi

karûbarê hunermendiyê daketa, dê ew bikuştana û haya kesî jî pê nediket.

Ji ber van sedeman li Kurdistanê fikra hunermendiyê bi min re çênebû. Peyre ez bo Ewrûpayê derketim û bi Şivan re zewicim. Şivan û derdora wî ya siyasî bo strandinê ez li karê hunermendiyê germ kirim. Lewre Şivan pê dizanî, ez dê bikaribim bistrêm. Ji ber ku me ji zû de hev du dinasî. Şivan gote min, tu dikarî lê naxwazî. Dawiyê dawî ez lê xebitîm û min hunermendî ji xwe re kir kar.

Hûn ji zû de ye karê hunermendiyê li Ewrûpayê digerin. Gelo aliyên erênî û neyînî yên vê xebatê çî ne?

□ Em wekî xelkê ne xwedî dewlet in. Problema me ya herî mezin ev e. Li welatê me statûyeke bi vîrengî tune ye. Dema ku mirov xwedî welat û sazî be, ev yek gelekî bikêr û girîng e. Bi taybetî ji bo kesên jîr û jêhatî îmkân peyda dibin. Lewre gelek kesên ku dewlet

piştgirîya wan dike jî, bi pêş nakevin. Divê hunermendî di karakterê mirov de hebe. Pêwîst e doz û daxwaza hunermendiyê jî dil be. Heke na, mirov nikare tiştêkî hêja biafirîne. Bêguman peydabûna îmkân gelekî girîng e. Lê ez îmkân nadim beriya her tiştî. Bo min îmkân talî ne. Wekî min got divê hunermend

b i b e
b e n g î
û

evîndarê karê xwe. Çaxê berhemeke hêja be û rihê neteweyî ragihîne, dê bi ser bikeve.

Li aliyê din ger me li wê derê (Bakur) stranên siyasî bigotana an ez girtî bûm an jî hatîbûm kuştin, dê her tişt bihata serê min. Lewma her kesê ku dil dike karûbarê hunermendiyê û dixwaze di vî warî de bi pêş bikeve, derdikeve derve.

Baş e. Derketina bo Ewrûpayê rizgarî ye?

□ Li Kurdistanê rê bi tenê li ber hunerê nehatiye girtin, li ber her tiştî hatiye girtin. Lewre huner bo civakên wekî kurdan gelekî pêwîst e. Ji bo vê yekê her tim bala dagirkeran li ser hunera kurdan e.

Xebata hunermendên kurd li derveyê welêt ji bo afirandin û pêşkêşkirina hunereke hevbeş çawa ye?

Di vî warî de problem hene. Lê ne tenê hunermendên kurd, yên cihanê jî bi têra dil nikarin hevkarîyê bikin. Bo nimûne li Ewrûpayê hunermend bi riya şirketên kasetan têne ba hev û berhemên hevbeş pêşkeş dikin. Ez ne bawer im hin kes bi serê xwe projeyê hevbeş bigerin, proje wan tînin cem hev. Proje hebin jî, gelekî kê m in. Rewşa kurdan ji gelên din cihêtir e.

Rast e, hevkarîya kesên kê m e û tevî vê yekê welatê me parçebûyî ye û hêzên me jî hevkarîyeke xurt nakin. Ev cara yekemîn e ku hunermendên kurd di hundirê saziyêke wekî MED-TV'ê û Akademiya Çand û Hunera Kurdî de têne cem hev. Berê pir zehmet bû, mirov du hunermendên kurd bianîna cem hevudin. Ez bawer im niha ji berê

Divê hunermendî di karakterê mirov de hebe. Heke na, mirov nikare tiştêkî hêja biafirîne. Bêguman peydabûna îmkân gelekî girîng e. Lê ez îmkân nadim beriya her tiştî. Bo min îmkân talî ne. Wekî min got divê hunermend bibe bengî û evîndarê karê

xwe. Dema berhemeke hêja be û rihê neteweyî bihewîne, dê bi ser bikeve.



Hunermend

Pêwîst e hecêfa hun

Gulistan: mendê kurd mezin be

Yekîtiya Hunermendên Kurdistanê gava yekem e. Lewre mirov nikare bibêje bersivê didê. Hedefa me gelekî mezin e. Pêwîst e hedefa hunermendên kurd pir mezin be. Ger mirov, ev tiştên ku 15 sal in Ewrûpayê pêk tên, bîne ber çavên xwe, dê 15 salên din tiştên hêjatir çêbibin



"Navê kurê me Abdullah Öcalan lêkir"

Gulistan Perwer, her çend hevji-na Şivan Perwer be jî, bi tenê wekî 'jina' Şivan Perwer nayê nasîn.

Gulistan, bi deng û tevgera xwe navdar bûye û wekî Gulistan hatiye naskirin.

Malbata Gulistanê di binyata xwe de ji Mêrdînê ji navçeya Midyadê ji gundê Kevezê ye. Lê malbat ji ber karûbarê meletiyê koçî Rihayê dike. Gulistan li gundekî, di navbera Sêwreg û Wêranşarê de, ji dayik bûye. Her çend malbata wê, dema ew heşt salî ye koçî bajêr dike jî, têkiliya wan bi gund re qut nabe. Lewre jî Gulistan bi kevnoreya kurdewarî mezin dibe.

Malbata Perweran ji zû de ye li Ewrûpayê diji û bi navê Serxwebûn lawekî wan heye. Serpêhatiya navlêkirina Serxwebûn jî hêjayî vegotinê ye. Gulistan vê yekê wisa vedibêje: "Birêz Serokê Neteweyî Abdullah Öcalan navê Serxwebûn lê kir. Dema bihistiye ku kurekî me çêbûye, bo me nameyek şand, ez bawer im telefon jî da û got: "Bila navê kurê we Serxwebûn be." Bi rastî me jî ji navê Serxwebûn hez kir û li kurê xwe kir."

wekî Awistiryayê û Almaniyayê ava kirine? Na. Ew ji qers û qonaxan derketine. Çanda herî bilind di dema feodalîzmê de çêbûye. Ew qral û paşa jî feodalên herî mezin bûn. Di ola Xiristiyanîyan de berî ronensansê li sarayan senfonî, bale û opera pir pêşketî bû. Ya me kulturekê me ya wiha tune. Ma Xwedê dê ji me re Mozartan bişîne? Pêwîst e bingeha wê hebe ku Mozartek derkeve.

HEVPEYVÎN: Î. CAN DILBIRÎN

Lêborîn: Di hejmara Azadiya Welat a 146'an de berendama PDS'ê ya bo Parlamentoya Ewrûpayê Felek Uca wekî parlementera PDS'ê ya Eyaleta Bakur ya Elmanyayê hatiye ragihandin. Ji ber vê yekê em ji xwendevanên xwe lêborînê dixwazin.

gelekî baştir e.

Aniha Yekîtiya Hunermendên Kurdistanê di bin banê Akademiya Çand û Hunera Kurdî de hatiye avakirin, bi nêrîna we ev sazî bersiva pêwîstiyên dide?

□ Ev gava yekem e. Lewre mirov nikare bibêje bersivê dide. Hedefa me gelekî mezin e. Pêwîst e hedefa hunermendên kurd pir mezin be. Ger mirov, van tiştên 15 sal in Ewrûpayê pêk tên, bide ber çavên xwe, dê 15 salên din tiştên hêjatir çêbibin.

Têkoşîna rizgariya gelê kurd pir berfireh bûye. Bi baweriya we hunermendên kurd di vî warî de bi rola xwe radibin?

□ Hin kes li vê yekê dixebitin. Karê hunermendiyê jî bi qasî şoreşê muhîm e. Serpêhatiya hunermendan wekî serpêhatiya çêkirina peykerekî ye. Bo nimûne, dema peykertraş peykerê xwe çêdike, berî ku wî têxe cest, wekî zarokên nû peyda dibin, dest, ling, dev û çav û hwd. çêdike û karê xwe dibê serî. Mesela huner jî eynî wisa ye. Ger mirov di warê şoreş û têkoşînê de bi taybetî di warê huner de, yanî muzik, lîxistin, aranjekirinê de ne serketî be, nikare bersiva her du waran jî bide.

Li aliyê din em tiştêkî jî bîr dikin: huner kolektîvîzm û hevkarî ye. Di nava stranbêjên kurdan de kêr kes hene ku dikarin stranên xwe bi xwe çêbikin, bistirên an jî aranje bikin. Di nava kurdan de, ev tişt hêdî hêdî çêdibin. Dema me dest pê kir, me bi xwe çêdikir. Jixwe aranje tunebû. Me tenbûr, saz û darbûka lîxistinê. Lê niha ev tişt têra min nake, ez dixwazim ku derfetên me hîn baştir bibin, da ku em tiştên baştir çêbikin.

Baş e. Kurd ji hunermendan tiştên nû dixwazin. Gelo hunermend vê yekê çiqas bi cih tînin?

□ Ev tiştêkî xelet e. Nûbûn stîlek jî jiyanînsanan e. Vê yekê tu di rihe xwe de dipejirîni û hest dikî. Lewma ne karê her kesî ye ku ji têkoşîn û şoreşê re bibe bersiv. Têkoşîn mîna volkanekî ye. Divê di jiyana hunermend de êş hebe. Hinek hene carina dikevin jiyana dinyake din. Di rastiya jiyana huner-

mend de jî hinek aliyên softiyê hene. Çawa ku sofî jiyana xwe didin xwedê, divê hunermend jî jiyana xwe bidin huner, felsefe, bîr û bawerî, tarîxê fêr bibin, bixwînin û guhê xwe bidin ser muzikê, amûrên muzikê lê bixin. Ango hunermend divê giraniya xwe bide karê hunerê. Ez bawer im kesên ku wisa bikin, wê bikaribin di rihê xwe de hunerê jîndar bikin.

Bi taybetî ji bo kurdan huner tê çî wateyê?

□ Muzîka kurdan li gorî civaka kurdan şikl û teşe digire. Mesela em dibêjin stran û kilamên feodalî, lê em dinêrin muzîka me ya klasîk di dema mîran de kemiliye. Ji ber ku di odayên mîran de, her tim stranên feodalî hatine strandin. Esas ev stranên klasîk nagihêjin heya bi hezar salî. Lê wan civatan ew jî ku girtine? Beriya wan jî, ev model rûniştine. Di civata me de, jiyana feodal, mîrîtî û axatî, ne ji niha ve ye, 600-700 sal in li Kurdistanê peyda bûye. Yanî çî bikirana jî, dê muzîka klasîk rehên xwe berdana nava civaka kurd. Muzîk wisa ye, mirov nikare yekcar ji jor ve daxîne nava civakê. Pêwîst e jî nava gel derkeve.

Li aliyê din gotineke tirkî hêye dibêjin "Muzîk bir yaşam tarzidir (Muzîk şeweyekî jiyane ye)." Îro kurd di pêvajoyeke pir girîng re derbas dibin. Ev dem jî bo me pir girîng e. Kurd êdî fêrî jiyana bajarvaniyê dibin. Tu caran wekî îro fêrî jiyana bajarvaniyê nebûbûn. Ji ber ku her dem bajarên kurdan jî aliyê xelkê ve hatine bîrê ve birin. Tim desthilatdar li bajarên hebûne û kultura wan hinekî xurt bûye. Lê vê gavê êdî muzîka me ya nû jî divê hinekî bajarî bibe.

Gelo hûn dibêjin bila berê xwe ji klasîkên xwe badin?

□ Na. Bi baweriya min dîsa klasîkên kurdî û folklorê kurdî, dikare riya muzîka kurdî veke. Lewre divê bingeha muzîka kurdî li ser vê yekê bê danîn.

Baş e. Hûn dikarin şewaza hunerî ya Gulistanê ya kevin û nû bidin ber hev?

□ Gulistana beriya 20 salan keçeke

biçûk bû ku pir li dinyayê negeriyabû. Ew qasî ne xwedan tecrûbe bû û bi pêş neketibû. Bi qewla kurdan; "kesa dinyanedîtî" bû lê ez kêfxweş im.

Pir kes di vê demê de huner ji xwe re wekî hacetekî bi kar tînin. Bi dîtina we huner çî ye û hunermend çî kes e?

□ Hunermend neynika civakê ye. Gava tu bixwazî ka civakek çiqas pêşketî ye, li hunermendên ku ji nava wê civakê derketine, binihêre. Lê hunermend jî ezmên daneketiye, ew jî zaroka wê civakê ye. Lewma mirov nikare hunermend jî civakê qut bike. Ew mîrasa civakê ne, divê mirov li wan xwedî derkeve.

Hûn dikarin mînakina bidin?

□ Ez nabêjim hemû kes. Hunermendê rastî sernamê civakê ye, ne ew kesên ku li ser mîrasa civakê rûdinin û tiştêkî nakin.

Dema ku mirov li hinek hunermendê kevn dînerê, yên wekî, Mihemed Şêxo, Miradê Kinê, M.Arif, tiştên nû afirandine. Tevî ku tenê amûreke wan hebûye jî. Hûn ji bo wan çî dibêjin?

□ Ew hunermend in. Di nava me de hunermend hêye û dengbêj hêye, em van tevî hev dikin. Kesê hunermend ew e ku diafirîne û li gorî xwe stîlekê çêdike. Min di pirtûka Ehmedê Xanî de xwend, dibêje: "Mirov nikare ji Ehmedê Xanî re bibêje filozof". Lewre ne xwedî raman û rêbazeke cihêreng e. Dibistanên wê hene, çî olî û çî modern. Bo nimûne Mihemed Şêxo tiştê di rih û dilê xwe de daxist ser kaxizê û got: tiştê ku di rihê de wî de di mējiyê wî dilive.

Yanî hûn dibêjin pêwîstî bi mējiyê azad heye?

□ Ew tev Mirado, M.Arif, mirov dikare bibêje Şivan Perwer jî, gelek kes di civaka me de hene tiştina diafirînin. Wekî bi pênûs û boyaxê reng bidine tabloyekê.

Mesele di nava kurdan de çima Mozartek dernakeve, di warê hunera şoreşgerî de?

□ Ma kurdan tu caran împaratoriye

Teatra Jiyana Nû li ser tûrneya Almanyanayê axivî: 'Em hatin almanan jî dîn bikin!'

Teatra Jiyana Nû berî niha bi demekê li ser dawetê, li dora 15 rojan li 15 bajarên Almanyanayê derket pêşberî temaşekarên xwe û listika xwe ya bi navê "Komara Dînan: Şermola" pêşkêş kir. Me li ser vê tûrneya bo Almanyanayê digel endamên Teatra Jiyana Nû kurtehevpeyvînek pêk anî.

Hûn dikarin serpêhatiya vê tûrneyê bo xwendevanên me vebêjin?

■ Li dora salekê ye ku plana vê tûrneyê tê gerandin. Tûrne, ji dema projeyên şanoya Şermolayê ve tê organîzekirin. Li Stuchgardê komeleya bi navê Zentral Culture Centrum bi boneya projeya "Culture Brucke (Pira Çandî)" em ji bo 15 rojan vexwendin Almanyanayê. Armanca vê tûrneyê di nava gelan de danûstandina çandî bû. Jixwe navê tûrneyê wekî "Di Nava Gelan de Pira Çandî" hatibû danîn. Me 1516 rojan li 15 bajarên Almanyanayê şanoya "Şermola: Komara Dînan" pêşkêşî gelê alman û kurd ê li Almanyanayê kir.

Temaşekarên we piranî kî bûn û helwesta wan çawa bû?

■ Yek ji armancên vê tûrneyê jî nas kirina şano û çanda alman bû. Li aliyê din em dikarin bibêjin şanoger an rewşenbîrên alman dibe ku cara yekem e li şanoya kurdî temaşe kir. Heye ku ev hewl jî bo şanoya kurdî destpêk e. Lewre heta niha me tiştekî wisa nekiribû. Bi taybetî me listikên xwe pêşkêşî kurdan dikir. Lê li vê tûrneyê li gelek bajarên hema bêjin temaşekarên me nivî kurd bûn, nivî alman bûn.

Bas e. Di warê fêmkirina şanoyê de temaşekar neketin tengasiyê? Çi kurd çî alman...

■ Hevalên ku ev tûrne saz dikirin, ev yek bi biribûn. Lewre dema li Şermola temaşe dikin, tê digihêjin ku dê kesên kurdî fêm nakin jî mesaja Şermolayê hilînin. Jixwe pêşkêşkirina şanoyê temaşekarên alman û kurd rexneyên pozîtîf li me kirin. Wan, nirxandina xwe ne bi peyvan bi tevger û helwesta xwe da der. Jixwe di Şermolayê de ji gotinan bêhtir tevger û mîmîk berbiçav dibin.

Organîzatorên tûrneyên broşûrek amade kiribû. Di broşûrê de der barê her sahneyê de agahî hebûn. Bêguman zimanê şanoyê neteweyî ye. Lê em dikarin bibêjin % 100 nebe jî bi giştî mesaja me hate hilanîn.

Hûn dikarin reaksiyona temaşekaran bi taybetî yê alman hinekî din bidin xuyakirin?

■ Almanya ji aliyê şanoyê ve welatekî gelek pêşkêşî ye. Bes niha pêdiviya şanoyê pir zêde nîn e. Ango ew wisa dibînin. Lê piştî ku wan li Şermolayê temaşe kir, gelek derhênerên alman bo me got: "Piştî ku me ev listikê dît, ev hest û raman li me peyda bû: Hîna pêwîstiya civakê bi şanoyê heye." Ji ber ku problemên me û almanan ne wekî hev in. Lewre gelek şa-

alman kurdan tenê di meşan de nas dikin. Ji aliyê çandî û hunerî ve kurdan zêde nas nakin. Dawiyê ev hest û raman bi kurd û almanan re çêbû: Kurd jî dikarin berhemên hunerî yê serkeftî biafirînin. Her dostekî alman an jî kurdên ku li me temaşe dikirin, em dawet dikirin. Her wiha em bo Festîlava Hêkan a Navneteweyî jî hatin vexwendin.



Teatra Jiyana Nû, vê tûrneya xwe ya yekemîn, di şexsê Aynur Artan de, diyarî hemû çalakvanên ji bo piştigiriya Serokatiya PKK'ê xwe şewitandine dike.

nogerên ku em li hev rûniştin, şanoyê wekî tiştekî bêkêr dibînin. Lê li aliyê din van kesan jî digot: "Me bi listika we de dît ku, şano jî bo civakê tiştekî kêrhatî ye. Ne bi tenê jî bo kêfxweşiyê her wiha jî bo problemên civakê jî tiştekî gelek girîng e." Li Ewropayê şano zêdetir li ser teknîkê tê avakirin û lewre wekî teknîkekê tê bikaranîn. Ji ber vê yekê jî psikolojî û problemên civakê dîr e. Civak jî ji xwe biyan e. Loma şano jî bo civakê wekî tiştekî pêwîst nayê dîtin. Lê ji bo Rojhilata Navîn bi taybetî bo kurdan gelekî pêwîst e. Her wiha me li gelek cihan Berthold Brecht ji wan bêhtir diparast. Lewre hin kesan digot: "Dema Brecht derbas bû" Em ne di vê baweriyê de ne. Ger şano problemên civakê bîne ser zimên, dema Berthold hiç naqede.

Di piraniya sohbetên ku pêk dihatin de ecêbmayîn û hezkirineke pir mezin hebû. Hinekî bi hestiyarî be jî, ji ber ku wan cara yekem li listikeke bi kurdî temaşe dikir, hestên bêserûbin li wan peyda bûbûn. Bi taybetî aksiyon, tevger û mîmîkên me pir ecibandibûn. Di nava temaşekarên me de zarok jî hebûn. Li Almanyanayê bêyî şanoyên zarokan, zarok nikarin li listikên din temaşek bikin lewre nehêlin ku ew bîkevîne salonan. Li aliyê din piraniya van zarokan bi kurdî nedizanî. Me gazî zarokan jî kir, her çend bi tîra jê fêm nedikirin jî li gorî xwe hin mesajê hilanîbûn. Hem di wexta listikê hem jî piştî listikê wan rexneyên pozîtîf li me dikirin.

Hest û ramanên temaşekaran yê li ser doza kurd û çanda kurd çawa bûn?

■ Kesên ku lê temaşe di kir an dostên alman pirsên bi vê rengî jî me dikirin: "Hûn dikarin bi rehetî listikên xwe pêşkêş bikin ango helwesta dewleta tirk li hemberî we çî ye?" Bêguman me zordarî û çewsandina li ser me bi her awayî anî ser zimên; wekî girtina salonên me, binçavkirin, komkujiyên li Kurdistanê hwd... Bi giştî bi van tiştan dizanin. Lê bi taybetî ji ser sehneyê derdestkirina hevalên me gelekî bala wan kişand. Şaş û metel diman û digotin: "Çawa tiştên bi vî rengî dikin?"

Wekî din jî kurdan tenê di meşan de an jî di çalakiyan de nas dikin. Ji aliyê çandî û hunerî ve kurdan zêde nas nakin. Dawiyê ev hest û raman bi kurd û almanan re çêbû: Kurd jî dikarin berhemên hunerî yê serkeftî biafirînin. Her dostekî alman an jî kurdên ku li me temaşe dikirin, em dawet dikirin. Bo nimûne em bo Hollanda, Îngilistanê û Awistiryayê hatin dawetkirin. Her wiha em bo Festîlava Hêkan ya Navneteweyî jî hatin vexwendin. Dibe ku di meha avrêlê de em herin Îngilistanê. Bi kurtayî pêgirtin û dilgermiyê mezin hebû. Di pêşerojê de li gorî karîna xwe dibe ku em jî wan dawet bikin û dawiyê em van festîvalan ber bi Kurdistanê ve bibin.

Lê li aliyê din dema em vegeeriyên Stenbolê, da ku em beşdarî Festîvala Şanoyê ya li Enqereyê bibin, hate ragihandin ku listika me ji programê hatiye derxistin.

Hûn wekî şanogerên gelekî ku doza azadiya xwe dike, tûrneyên bi vî rengî çawa dinirxînin?

■ Wekî me di serî de jî got êdî şanogerên alman ji kêşeya kurd heye. Ew bawer dikim ew jî wê bi vê tesîrê li kêşeya kurd gelê xwe agahdar bikin. Wê ev kes li derdora xwe propagandaya dewleta tirk ku tevgera kurd wekî terorîst şan dide, bi avê de bibin.

Dawiyê tiştekî ku hûn li ser gotinê xwe bikin heye?

■ Mesele me ne tenê listikê pêşkêş kirin e, lewre hunermend wekî nûnerê civakê jî tene dîtin. Di dema tûrneyê de li liyekî me ev wezîfe jî bi cih anî.

Li aliyê din çalakiyên ku li zindana bo piştigiriya Serokê Neteweyî pêk hatin li cem me gelekî girîng in. Yek ji wan gotiyan jî Aynur Artan bû. Me li wê derê got, me ev tûrne di şexsê Hevala Aynur Artanê de diyarî van hevalên ku bedenê xwe kirine meşale kir. Lewre Hevala Aynur nêzî salekê bi me re xebitî û keda wê jî di xebata me de heye. Ew, têkoşereke dil û can û dilsoz bû û vê yekê tesîr li me jî kir.

Di hevpeyvîna me ya bi radyoyekê jî pirsibûn "Hûn ji bo çî hatine vir?" Me jî got: "Em hatin gelê alman jî dîn bikin!" Bi rastî jî di şexsiyeta gelê kurd de em dixwazin gelên dinyayê jî dîn bikin. Ev jî bo me tiştekî ne nû ye. Lê lazim e gelê kurd dîn bibe. Yanî dîn hene pir xedarî lazim e mirov wisa bibe.

Em dikarin mizgîniyê jî bidin, dê rojên pêşiya me de Şermola di MED-TV de were pêşkêşkirin.

Teatra Jiyana Nû li Navenda Çanda Tohumê

● 6.12.98, **yekşem**: Teatra Jiyana Nû bi listika xwe Komara Dînan

"Şermola" li Navenda Çanda Tohumê ye.

Em, nezanî, Xwederbirin, Lêgerîn, Hesret, Evîn, Pirs, Jan, Jinbûn, Dîrok, Perçebûyîn, Kolebûn, Bêçarebûn, Poşmanî, Şervanî, Bengîlî, Qirîn, Ked,

Û AZADIYA xwe

Dilîzin.....

Saet:15.00

Navnîşan: Soğanlı Mah. Min. ar Sîmanî Cad. No: 116/5 Bahçelievler

CALAKIYÊN HEFTEYÎ



NÇM İzmir

● 5.12.98, **şemî**: Konferans "Şer û zarokên kolanan". Zübeyit Gün (Komeleya Parastina Zarokên Kolanan), saet:18.00

● 6.12.98, **yekşem**: Konsera Hazan Cezmî 'Warê Mezin'. saet:18.00
11.12.98, in: Konferansa Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê "Mahabad û Qazî Muhammed" Mele Reşîr-Mele İsmet, saet:18.00

YÇKM

● 11.12.98, in: Filmê Kule Wampe. Derh:Bertolt Brecht, saet:19.00

Êrîşên li ser medyayê û rojnamegerên kurd dom dikin

Berpîrsê Karên Nivîsaran ê Azadiya Welat, M. S. Taşkesen, ji ber wêneyê berga 123'yan hetî girtin.



xwe dide zanîn ku biryara girtina Taşkesen biryareke ne-hîqûqî ye, biryareke siyasî ye.

Ligel vê dîsa xebatkarê nûnergeha İzmirê Mirzat Satî jî roja 26'ê sermawezê piştî şeş rojên binçaviyê, ji aliyê DGM'ya İzmirê ve hate girtin. Ew jî niha li Girtîgeha Bergamayê ya İzmirê ye.

Demek berê dîsa biroya Mêrsînê jî aliyê faşîstan ve hatibû dagirkirin û hevalê me Ekrem Hazar bûbû hedefa êrîşên wan. Her wiha bi êrîşên dawîn ên li ser HADEP'ê re rojnameyên ku li van deran bûn ligel weşanên din hatin desteserkirin. Ev dîsa hem jî aliyê agahdarkirina xwendevanan ve hem jî ji aliyê aborî ve ji bo rojnameyê zordariyek din derdixe ber xwendevanan û rojnameyê.

Çapemeniya kurd dengê têkoşîna gelê kurd e

Wekî tê zanîn ji bo rojnameya rojane Ûlkede Gündemê 30 roj ceza hatibû birin. Ev ceza kuta bû lê dîsa ceza li ser cezayê jê re tê û êrîşên li ser xebatkarên nûnergehên wê jî berdewam in. Roja 27'ê sermawezê berpîrsê Nûnergeha Amedê İsmet Bakaç ê Ûlkede Gündemê nesibê xwe jî van êrîşan girt û ji çeteyan bi awayekî xedar lêdan xwar.

Tiştên hatin gotin tenê hin jî êrîş û astengkirinên li ser çapemeniyê bûn. Lê her êrîş bi xwe re pêşketinekê tîne. Xebat bi awayekî germtir berdewam in. Her çiqas bixwazin rê li ber medyaya kurd bigirin jî, dengê pêşveçûnên siyasî ji weşanên navneteweyî tê û her kes dibihîse û dibîne. Ji ber ku "Roj bi bêjîngê nayê weşartin." Her wiha dê çapemeniya azad li hemberî van êrîşan bi paş ve gav neavêje û dê van hewlên hêzên dagirker bi avê de bibe. Bi van êrîşan dewleta tirk pola av dide, polayê avdayî jî berê xurtir dibe.

AZADIYA WELAT

TÎŞK

Çi bikeyn?



BEKİR ŞIWANÎ

Le diwa qonaxî bîstem da, wate le sereta û kotayî salanî 90 da, dî rûdawî zor giring, kêsêy rew a û dêrîni gelî Kurdî hênaye rojevî ray giştî cihan û carekî tir hemû nîgakanî komelgay nêwdewletî û gelanî cihanî rakêya bo ser rûy zemîn.

Rûdawî yekem raperîni beşikoy cemawerî başûrî Kurdistan bû ke diway têkşikanî subay Iraq le Şerî Diwemî Kendaw da serî helda û kurd bo carî yekem le mêjûy niwê da, destiyân girt be ser hemû xakî başûrî Kurdistan da. 8 sal be ser ew roj-gare da têperî, ca aya kurd ta çî radeyek tiwaniyan ew hele dîrokiye biqozinewe û sîdî lê werbigrin, ewe basêkî tir e û mirov detwanê bi wirdbûnewe le barûdoxî ew herême, welam be dest bixat.

Carêkî dî û le kotayî sedey bîstem da, nawî kurd û kêşey rewakey le derwazeyekî zor firawanewe deçetê ray giştî cihanewe û helekî zêrîn bo kurd dête arawe. Belê, diway ewey ke Serokî Giştî Partî Kirêkaranî Kurdistan Abdullah Öcalan, beşek le niwê nîgakan çûnewe ser kêşey kurd û dewlete gewrekanî Ewropa bas le çareserkirdinî kêşey kurd deken û bo ew mebeste bîr le bestinî konfiransêkî nêwdewletî dekenewe.

Lêre da pirsîyarêk dête arawe; Aya çî bikeyn bo ewey bitwanî em tewjmey êsta biparêzîn û kêşey reway gelekeman le ser astî cihan be germî rabigrîn? Bêguman rîzêk erkî be pele heye ke pêwîst e gelî kurd û hêze siyasikanî kurd pêy hestin û diwa nekewin le cêbecê kirdinî. Bo nimûne pêwîst e û zor giring e camawer sist nebêtewe û berdewam bêt le xopîşandan û niwandinî çalakî le çîwarçêwey yasa û dîmokratî da. Erkêkî tir pîrepêdanî peywenî ramiyarî nêwan leyane kurdiyekan û le gornanî nakokiyekan û binebirkirdinî şerî nawxo ye. Eme seray pêwîst bûnî çalakkirdinî dezgakanî rageyandin û nîşandanî kêşey kurd le ser binaxey yek kêşey neteweyî. Heman kat bayex bidrê be pitewkirdin û behêzkirdinî baskî serbazî şoriş bo berengarbûnewe hemû core encamêk.

Çûnke wa derdekewê lem rojgare û serdeme da, diplomasi û karî siyasî eger hêzî le piştewe nebê, wekî pêwîst û dawakiraw naçête pêş. Emane beşek in lew erkaney ke lem qonaxe da dekiwine estoy hemû çîn û tiwêjekanî gelî kurd.

Hêze siyasîyekanî Kurdistan û pêkewe berpîrsiyar in beranber be çarenûs û dahatûy netewekeman.

Çanda civakê di nav pêvajoyeke dûvdîrêj de, tê meyndin, dipije, digihêje û dikeve kirasekî neteweyî. Çanda hemû gelan ji qumaşê gerdûna me ya temendirêj hatiye birîn. Qumaşê gerdûnê jî, ji ax û keda destê mirov hatiye pê. Lewra li cihê ku xwêdana eniyê, hêza destê mirov û siruşt bi hev re têkiliyekê deynin, berhemek derdikeve holê. Navê vê têkiliyê afirandin e. Afirandin jî bi xwe re çand û şahrezayiyê derdixe holê. Mînak: Li herêmên ku ceh û genim lê tê çandin, dûrik, stran, gotinên pêşyan, biwêj, listik, têgihên hilberînê, mamik, efsane, çirok, mît û gelek bawerî di heqê çandiniya ceh û genim, paleyî, bender, aş, xela, baran û hwd. de ne. Wekî vê stranê:

Hûr genimo hûr genimo
Genim genim gela
Hûr genimo hûr genimo
Qorik zeriye mala



Bi guherîna rewşê, çanda gel qalik û kalanê xwe diguherîne

Ew genimê çala mazî çala mazî
genim genim gela
Min çinîbû bi çeplên tazî
Qorik zeriye mila...

Dîsa li ser dexlê mamikek, li gelek cihên Kurdistanê yên ku dexlê lê tê çandin, tê gotin:

"ka çû ma dan, ka çû ma dan"...

Mamikeke din jî em binivîsin, "sêv gindirî min sêv xwar, gû gindirî min sêv xwar." Di vê mamikê de, bêsansûriya nîrê feodalî dixuye.

Em li strana "Masîdar" ku ji derdora Çewlikê ye binêrin:

Hoy masîdar lê û lê lê lo û lo lo
Ew masîkê kevrê sor e
lê û lê lê lo û lo lo
Bêrîvan tên qor bi qor e
lê û lê lê lo û lo lo
Serê bêriya bi laçika sor e
lê û lê lê lo û lo lo

Hoy masîdar lê û lê lê lo û lo lo
Ew masîkê kevrê zer e
lê û lê lê lo û lo lo
Bêrîvan tên ref bi ref e
lê û lê lê lo û lo lo

Seriyê bêriya bi laçika zer e
lê û lê lê lo û lo lo

Ji ber ku li çiyayên der û dora Çewlikê gol pir bûne û di golan de masî hebûne ev stran ji nav dilê gel derketiye.

Sêvên Xelatê û yên Meletiyê jî ji gelek berhemên zargotinî re bûne malzeme. Zebeşên Amedê, Çemê Muradê û Firat, Çiyayê Sîpanê û berika Mêrdînê her wekî fêkî, çem, çiya û beriyên welatê ji bo zargotinê motîfên zengîn in. Lê ji ber ku bajarên mezînan hatine avakirin û kapîtalîzm bi awayekî weşîti xwe saz dike, ev motîf her ku diçe ji nav zargotinê kêmbûn.

Helbet zargotina der û dora çola Erebaşanê dê der heqê xurme, qûm, germ û hwd. de be. Li zozanê Şerêdînê jî zargotin, dê der heqê mih, bêrî, şîr, lorik, berf û hwd. de be.

Mewsim, erdnîgarî, çandinî, cureyên daran, berî her tiştî jî awayê hilberînê çanda neteweyekê dixemilîne û derdixe holê. Neteweyên ku ev rewşa mînanî hev be, çanda wan jî nêzîkî hev e.

Her ku rewşa civakê ya aborî bi pêş ve diçe û tê guhartin, rewşa birêveberina civakê jî tê guhartin. Ev

guherîn bi xwe re, bîr û baweriyekê nû, çandeke nûjen tîne. Mirov dikare di gotinên pêşyan de, guherîna civakê baş bibîne. Hinek gotinên pêşyan he ne ku mirov qet nikare wan di nav civaka îroyîn de bi kar bîne. Mînak, "Jin be û li ber mala xwe be". Îro jina kurd, di têkoşîna azadî û rizgariyê de, bi qasî zilaman serhildêr û lehenge. Ev gotin ne layiqê jinê ye. "Pîrek darê şikestî ye", "Biçûkê malê kûçikê malê ye", "Xal xwarziyan radike, ap biraziyan winda dike", "zava kerê xezûran e".

Wekî ku tê dîtin ev gotin, di civakê de lipaşmayî de hatine gotin. Di wê civakê de, li gorî mantiqê wê demê, ev gotin normal bûn. Lê li gorî rewşê, norm û baweriyên îro hukmê van gotinan nemaye.

Di biwêjan de jî ev guherîn pêk tê. Berê dema ku jinekê kêmayiyek dikir, ji xwe re wiha digot, "li min kezî kurê!". Li gorî pîvana wê heyamê kurkirin, ango qusandina porê jinê şerm bû. Lê îro bi vî awayî nayê fikirîn.

Ji bo guherîna baweriyê jî mirov dikare mînakekê bibêje. Heyama berê, yên ku law ji wan re çenedibûn, diçûn ser ziyaretan da ku kurek ji wan re çêbibe. Çêbûna keçê mîna ya law

dilxweşî nedibexşand. Ev bawerî ber bi guherînê ve diçe.

Di kevneşopîya navlêkirinê de jî guherîneke xurt xwe daye der. Berê kurdan an navê şêx, mişayix, mezine kî/e ereban li zarokên xwe dikir, an jî navê fermanî, rayedar û paşayekî osmanî, tirk li zarokên xwe dikir. Niha bêtir navên kurdî yên efsanewî, navên şervan û lehengên şerê rizgariya neteweyî li zarokên xwe dikin.

Stranên kurdî her çiqas ji kaniya xaka kurdî vebizên, reng, çeşn û zîzbûna xwe ji gelêrbûnê bistînin jî, li gorî rewşa civakê tene guhartin. Helbet temaya bingeşîr pir hindik hatibe guhartin jî kalanê guhartin. Lewra janên civaka kurd, bindestbûna wan nehatiye guhartin. Hestê bindestiyê û hêstirên çavên janan xwe bera nav dilê stranên didin. Wekî mînak, di stranên berê de jî têgihên wekî "bêbext, bêbextî, dijmin, koç, berî, xizanî û hwd." hebûn. Îro jî di stranên kurdî de, mirov van têgihan dibîne. Berê di stranên de mewzer, çapli, borno çekên di destên lehengan de bûn. Îro di stranên de, ev çek keleş e.

Wekî ku tê ber çavan, bi guherîna rewşa aborî û siyasî re çanda gel jî qalik û kalanê xwe diguherîne.


Kovareke temendirêj: **Kurdish Studies**

The International Journal of

Hejmara 12'yan a kovara "The International Journal of Kurdish Studies (Kovara navneteweyî ya lêkolînên kurdî)" derket. Vê kovara ku di salekê de du hejmarên wê têne weşandin, di sala 1986'an bi navê "Kurdish Times" dest bi weşanê kiriye, paşê navê xwe guhartiye. Kovar ji hêla "The Kurdish Library (Pirtûkxaneya Kurdî)" ve li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê tê weşandin û bi zimanê îngilîzî ye. Nivîsên cur bi cur ên li ser çand, dîrok û şaristaniya kurdan di nava rûpelên pirtûkê cih digirin.

Kovar bi pêşeka di bin sernavê "Ji Editor" de hatiye nivîsandin dest pê dike. Ev pêşek ji hêla Vera Beaudin Saeedpour ve hatiye nivîsin. Tê de li ser dîroka kovarê hatiye rawestandî û derbarê nivîsên di vê hejmarê de û nivîskarên wê agahî hatine dayin. Vera Beaudin Saeedpour dide zanîn ku dema Pirtûkxaneya Kurdî dest bi weşandina kovarê kiriye, li Amerîkayê haya kesî ji kurdan nîn bûye.

Di vê hejmara kovarê de jî kesên cur bi cur nivîsên li ser mijarên navborî nivîsandine. Di vê hejmara kovarê de cihê herî zêde ji xebata Ralph A. Blum re hatiye veqetandin. Wî li ser şikeftên li başûrê Kurdistanê lêkolîneke



ar-keolojîk kiriye. Ew şikeft li Çiyayê Zagros in. Dirûvê wan şikeftan hatiye ravekirin û digel şanîdana cihê wan li ser nexşeyan, wêneyê wan jî ha-

tiye pêşkêşkirin. Nivîsa duyemîn li ser rewşa kurdan a di destpêka sedsala 18'an ku welatê kurd bûye qada şerê di navbera Osmanî û Farisan radiweste. Ji sernavê nivîsê tê fêmkirin de ew nivîs bidome.

Kovar bi hevpeyvîna digel Ferhad Shakely derbasî mijara wêjeyê dibe. Di vê hevpeyvîna de nixandî û boçûnên Shakely li ser helbest, helbestvanî, rewşa helbesta kurdî, rewşa wêjeya kurdî, têkiliya wêjeya kurdî bi ya cihanê re hatiye rawestandî. Çiroka vê hevpeyvîna bi xwe hêjayî dabaşê ye. Ev hevpeyvîna di sala 1990'î ji hêla nivîskarê kovara Sirwe ku li rojhilatê Kurdistanê derdikeve hatiye kirin, lê ji ber ku rejîma Îranê destûr nedaye nehatiye weşandin. Ev hevpeyvîna ji hêla Muhammed Kemal ve li îngilîzî hatiye wergerandin û di kovarê de hatiye weşandin. Helwesta Shakely a li hemberî pirsê "helbest çi ye?" dişibe helwesta Şerko Bêkes a li hemberî heman pirsê ye. Shakely daye

zanîn ku ne pêwîst e ku mirov helbestvanîyê rave bike. Her wiha dîtînen Shakely yên li ser helbesta polîtîk jî hêjayî nixandîne ye. Lewre li gorî dîtîna wî bîr û rayên polîtîk ne mayinde, ne ji ber vê yekê jî helbesta ku ji bo mebesta piştevaniya bîr û ramanêke siyasî bê nivîsandin jî ne mayinde ye.

Mirov bi nivîsên di bin sernavê "Boçûn ji Parlamentoya Kurdistanê li Derveyî Welat" de derbasî nava mijarên siyasî dibe. Pêşî Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya di bin sernavê "Çareseriyêke siyasî bo kêşeya kurdî" dîtînen xwe pêşkêş dike. Yaşar Kaya di nava nivîsê de ji bo çareseriyê kêşeya kurdî pêwîstiya sistemeke federal tîne zimên û di dawiyê nivîsê de sedemên vê yekê rêz dike. Her wiha Kaya ji bo amadekirina bingeha aştiyê jî çend mercên pêwîst rêz dike ku di serî de agirbesteke dulanî cih digire.

Piştî Yaşar Kaya, Endamê PKDW'ê Aziz Bawermend dîtînen xwe di bin sernavê "Helbestvan û Siyasetmedar" de pêşkêş dike. Bawermend li ser rengê demokrasiya Tirkiyeyê û girîngiya çalakîyên PKDW'ê ramanên xwe derdibe. Her wiha di nava nivîsa wî de li ser çalakî û taybetiyên PKDW'ê jî hinek agahî hatine dayin.

SERWÎSA ÇANDÊ

Bila stêrk ji nav porên we biweşin

HASAN KAYA



Bimeşin ber bi şinahiya ewran ve. Bila aso mîna qalibek sabûna zeytûnî ya Dîlokê ji ber lingên we bişemite. Bimeşin ber bi şinahiye ve. Lewre pêleke dudurêj e, ku bextiyarî şevder e li êla we.

We çav pê neketiye, bi rojên ku dilxweşî di bibikên çavên we de hatiye daçikandin. Rahêjin mistek bextiyarî û bi nêrgizên dilşkestî re bîhn bikin û li ba bikin, bila çavên dilê we bibin şahidê bostek xweşî...Çimkî hûn zû ve dil kul in.

Piştî xwe bidine siya reşiya ku sedan sal e, li ser keskesora me mîna lepên celadekî digere. Bila kêlîkek be jî, destên tîrsa nerindiyê ji pêşira we vekişayî be. Ez jî nizanîm ku ev çiqas wext e, dilê we mîna gulokeke ji pembû di devên kêvjalî de tê cûtin. Bila dilopek be jî dilikê we binive...

Singên konê xwe yê dagirkirî li keviya bajarê azadiyê bikutin. Singên konê xwe

bikutin û benê wî bişidînin da ku roj carek be jî wekî kenê zarokeyê keşî li ser mirada dilê we bihêle. Bila hilbe roj li ser xeyalên temenê we lê ciwanî mîna caniya hespekî rehwan e. Dibe ku careke din dîmenê sirûştî çavteng neyê bexişandin, yek car be jî ji bo çavên we yên keserkûr...

Çend nîr di ser re bihurîn lê hê jî kilîda deng û devê te mîna tûjbûna dûzaneke ye. Girtî û hişbûyî. Lewre îro roja wê ye. An li bilindahiya çiyayekî an li bêserûberiya deştekê biqire, ne ji bo ku zilm guhên xwe miç bike (bigre) û tevzînokên şermê li ser pozê wê bijenin, nexêr ne ji bo ku poşmanî bixuye li ser rûçikên zilmê û neviyên Asena bîhna dilpakîyê bikin. Lê belkî ji bo ku carek be jî tu tama dengê xwe yê xesandî û kewandî bibihîzî...

Binêre, li Ewropaya ku li mazatê qet dilopek ken jî peyda nabe û jîyan wekî bûkeke xeydok her tim li mala bavan e, hemwelatîyên te mîna "darika zavê" xemilandî ne.

Mirovahî bûye mij û xunav difûre ber bi asîmanê vê parzemîna qedîm ve. Bêhnepakiya zerdeştîyan dibare bi ser gunehên rojhilatnas, xwedî şîrket û bazirganên Ewropî de. Serê hemwelatîyê te bilind e.

Ew doza "roja" xwe dikin.

Di dîrokê de cara yekemîn e ku bi hezaran dilên me yên ku bi sewta neyaran hatine kerkirin di yek qezanê de dikele û bi heman agirî...Pozê wan hemûyan bi hestê evîna rûmetê disoje. Kî çi dibêje bila bêje, roja ku tonek edalet ji kîloyek petrol girantir û bihatir bibe dê bi hewl û keda destên we yên mezlûm pêk were.

Ji her car û her heyaman nêzîktirî we ye, îkbal û talîha we yên ku koremaran ew li pişt heft çiyayan veşartibû. Va ye, li ber çoka we ye. Ku hûn destên xwe dirêj bikin, azadiyê hevrîşimî dê di nav mista we de bihele. Bimeşin û bila stêrk ji nav porê we biweşin. Bila stêrk biweşin û li dewsa piyên hovîtiya ku şarezahiya welatê me yê delalî di zikê xwe yê mezin de cûtiye bi tenê berfîn bibişkivin. Bila zimanê xaka me yê ku ji tîbûnê qelişîye, berfînan bialise da ku derman bibe.

Min bi çavên xwe dît, ji wî dilê te yê pelixî îro tîr diweşin. Êdî a niha evîn û têkoşîn sirûdeke serbestiyê ye, li ser lêvê te yê nazenîn. Lewre ez pir şanaz im, dev li ken û bextiyar im. De fermo em bi hev re bimeşin, bila şehîdên me ji çeperên xwe rabin û tevî senfoniya zîzbûniyê bibin...

Mele Gîzo û keşeyê Hezexê

Rezekî keşeyê Hezexê heyê. Hingî keşeyê pîr bûye êdî nikare pîr here nava rezê xwe. Rojekê dilê keşeyê diçe tirî. Bi rê dîkeve diçe nava rezê xwe. Keşa dinêre ku Mele Gîzo di nav rezê wî de ye. Keşeyê dibêje: "Looo kirî; tu bi ku ve çûyî. pêjna te nayê, min bêriya te kiribû. Mele Gîzo bersiva keşeyê dide, dibêje kirîv bi Xwedê ez her roj di nava rezê te de me; yê xuya nake tu yî, de ka bibêje tu li ku yî.

Ker namûs e

Rojek ji rojan li Xirabêripin kera ser cerdevan wînda dibe. Kesên li Xirabêripin jî tev cerdevan in. Navê sercerdevanê wan Cemil e. Cemil dibêje: Malxirabno! herin bigerin da ku hûn kera min bibinin. Yê cerdevan jî diçe ser banekî bang dihildêre. Dibêje hey hêêê gelî gundiyan! kera apê Cemil wînda bûye, herin lê bigerin.

Cerdevanê nezan û yê zana

Rojekê cerdevanê Xirabêripin li malê bûne, bi hev re sohbetê dikin. Yekî cerdevan ji cimateatê dipirse: "Gelo Apoyê Êrfayî çî ji me dixwaze?", yekî din dibêje: "Bêmejîno ma hûn nizanin

Apo ji bona axê şer dîke. Apo dibêje 'erdê me hatiye dagirkirin em vê axê dixwazin', cerdevanek radibe ser xwe dibêje: "Heyra bi Xwedayê mezin bi-hustek axa Apoyê Êrfayî di nav axa me de tune ye."

Apê Mûsa


Piştî sala 1990'î kurdî li Tirkiyeyê serbest dibe. Li Stenbolê li ser rewşa gelê kurd komcivînek çêdibe. Tirk û kurd gelek rojnamevan û rewşenbîr beşdarî vê civînê dibin.

Li ser serjimara kurdan gengeşî dibe, hinek dibêjin kurd deh milyon in, hinek dibêjin heft, ji her kesî hejmarek cuda derdikeve. Dora axaftinê tê ser Apê Mûsa. Apê Mûsa radibe ser xwe, dest bi axaftina xwe dîke. Dibêje: "Gelî hevalan ez dixwazim li ser mijara me mînakê jî xwe re bêjim. Rojekê keşeyê pîr rind di ber xortekî re dibore. Xort dibêje: "Keşikê ma tu dikarî ji wan lêvên xwe yên sor ramûsanekê bidî min?", keşik dengê xwe nake lê sola xwe şanî lêwik dide. Yanê dixwaze bibêje ez ê rahêjim sola xwe li serê te bidim. Xort dibêje: "Min ji jor xwest, te pîr ji jêr da, de werre em nîveka vî karî bibinin. Apê Mûsa mînaka xwe qedand û got: "Gelî heval-

lan hinan ji we got 'deh milyon in', hinan ji we got 'çar-pênc milyon in' de ka werin em nîveka vê serjimarê bibinin.

Mirtîb û Axa

Li herêma Mûşê, mirtîb konê xwe li gundekî datînin. Mirtîb sewalên xwe berdîdî çolê. Sewal diçêrin. Sewalên mirtîba çêrî çêrî diçin dikevin nava genimê axaya gund. Axa diçe nav genimê xwe hey hoo! çî bibîne dinêre ku sewalên mirtîban tev ketine nava genimê wî. Axa dema vê rewşê dibîne, hiş li serê wî namîne. Axa bi dest sixêfan dîke. Jineke mirtîban jî ji malê. Dinêre ku axa sixêfan dîke. Jina mirtîb jî dibîne ku axa hêrs bûye. Jina bersiva axa dide. Dibêje fis ha axa! fis ha axa! û dengê xwe bilind dîke. Axa piştî ku peyvên jinikê dibihîze hê bêhtir hêrs dibe. Wê biskê mêrê jina mirtîb jî serê xwe ji kon derdixê derve, dibêje: "Jinik çî bû, çî bû, çîma axayê me hew qasî



hêrs bûye?" Jinik dibêje: "Merik Xwedê min tiştê nekiriye. Lê belê sewalên me ketibûn nav genimê axa, ji ji bo vê yekê sixêf kirin. Min jî got "Fis haaa axa! fis ha axa!" mêrik got "Jinik nexwe wilo ye?" jinekê got: "Ewê mêrik wilo ye." Li ser vê yekê mêrik dibêje: "Jinik tu jî bibêje 'tir ha axa! tir ha axa!' jinikê dengê xwe carekî din bilind kir. Got: "Tir ha axa! tir ha axa!" Axa ku ev dengê ha kir yekcar dibû û vegeriya mala xwe.

BERHEVKAR: ÖMER HAYYAL

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (149) XAÇEPIRSA

Bersivê xwîndinê	Deveyan	S	Bûyestan	E	Tipêke	Ê	Kurê	K	Tipa 2 du
RA	B	R	D	B	Har	Ç	AR		
N	Zarî	L	M	AR					
K	A	K	R	A	S	A			
R	H	A	D	N	E	Z			
L	M	B	P	T					
A	M	E	D	E	K	A			
A	D	P	R	V	E				
A	Z	E	E	V	A	N			

PEYVA VEŞARÎ

Bersiva Xaçepirsa 147'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binixînin û bi rîya pişkê li 5 kesên belav bikin. Xelata hejmara me ya 149'an Kasetê Mihemed Şêxo 'Nesrîn'ê.

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.



Pênc kesên ku xelata 147'an Pirtûka 'Stranên Kurdî qezenc kirine ev in: İrfan Çewlik / Enqere, Neytullah Aydemir / Edene, Mesut Onatlı / Enqere, Seydo Başçı/ Riha, Fettah Tekirdağ/ Isparta,

Mantalite	Kese seym	Sewiye	Tipa dî	Naveki jinan	Stî
Tawir	Kinc (bi Osamnî)	Aza	5	Qetandin	
Bi kirdkirî		Dengdarê n not		Dem	
Parestgeh		Gelek		Sinif	
Lunghî...			Navçeyêke Amedê		
Parêzerê			Tipêk		
Öcalan					Sembola argonê
Sond					
1			Qirin	Navdari	
Tipêk	Tipa duyem	Şewe Naveki mêran		Agir	
Sembola iyotê	Pir				
	Sembola pota syümê	Nêrin			
	Notayek	Dengdarê n fas			
Biheq				Tipa yekem	
Sadik					
				Sembola argonê	

Derheqê Kirmanckî de Kombiyayîşê Pancine III

7) Termê gramerî

bükümlü dişil isim.....namayo anteyo makî (n)
bükümlü eril isimnameyo anteyo nêri (n)
büyük harfherfa girde (m)
cins ad (isim)nameyo cins (n)
cümlecumle (m)
cümlelerin yapısıawankerdişê cumle
çekilmekantış
çekmekantene
çoğulzafhûmar (n)
çoğul isim (ad).....nameyo zafhûmar (n)
dilziwan (n)
dilbilgisigramer (n)
dili geçmiş zamandemo virarteyo diyar (n)
dişilmakî (m)
dişil ad (isim)nameyo makî (n)
durum.....rewş (n)
durum zarfızerfa rewşî (m)
edatedat (n)
edebilmek.....şayene(şayîş), eşkayene (eşkayîş), besek-
den
edilgen fiilkaro passîf (n)
emir kipiraweya fermanı (m)
erilnêri (n)
eril ad (isim)nameyo nêri (n)
eşanlımlıhemmana
eşanlımlı kelime (sözcük) ..Çekuyo hemmana (n)
eşeslihemveng (n)
eşesli kelime (sözcük).....çekuyo hemveng (n)
etken fiilkaro aktif (n)
eylem (fiil)kar (n)
fiil cümlesicumleya karî (m)
geçişli fiilkaro transîf (n)
geçissiz fiilkaro întansîf (n)
gelecek zaman.....demo ameyox (n)

geniş zamandemo hîra (n)
gereklilik kipiraweya ganîyiye
gizli özne.....kerdoxo nimite (n) kerdoxa nimitiye (m)
harfherfe (m)
ilgeçedat (n)
isimname (n)
isim cümlesicumleya nameyî (m)
isim tamlamasıîzafeya nameyî (m)
istek kipiraweya waştene (m)
işaretnîşan (n)
işaret sıfatı.....sifetê nîşankerdenê (n)
işaret zamiri.....zemîrê nîşankerdenê (n)
iyelik adılı (zamiri).....zemîrê wayîriye (n)
karşılaştırma sıfatısifetê pêveronayîşî (n)
kelimeçeku (n)
kesir sayılarhûmarnameyî kesîrî
kiprawe (m)
kuralı fiilkaro qaydeyin (n)
kualsız fiilkaro bêqayde (n)
küçük harfherfa hurdîye (m)
lûgatferheng (n)
lûgatçaferhengek (n)
mastar.....mesder (n)
mişli geçmiş zaman.....demo vîyarteyo nêdiyar
muktedir olmakşayene (şayîş) eşkayene
(eşkayeyîş) besekerdene
mülkiyetzemîrê wayîriye (n)
nesne.....obje (n)
niteleme sıfatı.....sifetê senîniye (n)
nötr ad.....nameya notr (n)
nötr isim.....nameyo notr (n)
olmak.....bîyene, bîyayene
olumlu.....pozîtîf, -e
olumlu cümle.....cumleya pozîtîfe (m)
olumlu soru.....perso pozîtîf (n)
olumsuznegatîf, -e
olumsuz cümlecümleya negatîfe (m)
olumsuz soruperso negatîf (n)
olumsuzlama edatıedatê negatîfe (n)
önedatveredat (n)
önekprefîks (n)
özeltaybetî (n), taybetiye (n)
özel adnameyo taybetî (n)
özel isimnameyo taybetî (n)
öznekerdox, -e
sanal geçmiş zamandemo vîyarteyo niyetin (n)
sayıhûmar (m)
sayı sözcüğühûmarname (n)
seslivengin, -e
sesli harfherfa vengine (m)
sessizbêveng, -e
sessiz harfherfa bêvenge (m)
sıfatsifet (n)
sıfat tamlaması.....îzafeya sifetî (n)
sıra cümlelerhevokê rêzkî
sıra sayılarhûmarnameyê rêzkî
soneksuffîks (n)

(Dewamê ci esto)

D'Alama û Schöderî zehrê Tirkîye teqna

Serokwezîrê Îtalya Massimo D'Alama 28'ê menga sermawez de Almanya ziyaret kerd û Serokwezîrê ci Gerhard Schöderî ya Îtalya şiyayîne Serokê PKK ser, pêdiyin viraşt. Peyniya pêdiyinê her di serokwezîran de, derheqê pêdiyin de eşkerakerdin viraziya. Eşkerakerdin de vajiya ke Almanya ya Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî, Îtalya ra mewazo û iyê o roj ra tepiya qandê çareserkerdina mesela kurd, bi raya demokrasi û siyasiya însiyatîf bigirê xo dest.

Ancî qandê (seba) Serokê Giştî yê PKK mehkamakerdin jî, iyê jû mehkamaya navneteweyî ronê. Qandê nê fikran û vînanan ca ardin jî, wezîrê teverê nê her di welatan ê çend rojan miyan de bêrê pêser û gama verin çekirê. Winî jî bi, her di wezîrê nê welatan amey pêser û gama verin çekerê û iyê hetanî kombiyayîne Jûwîna (yewîna) Ewropa yo ke 9'ê na meng de viraziyo, jew rapor hederê bikirê. Yanê heme çiyoy, peyniya nê raporî de eşkerê bibo. La belê çiyoy muhîm o yo ke eşkerabiyayîne nê fikr û vînanan peyra, PKK no fikr qabûl kerd, labelê wast ke dewleta tirk jî, a mehkama de ca bigiro ke, wa sûcdaro rastin û sebebê nê 'Şerê Lîminî' vejiyo werte. Feqet serdarê dewleta tirk, senî (çitor) ke nê fikr û vînanî eşnay, vaten ke ca de bo, zehrê ci teqa û adir kewt ci. Çira?


Çi ke dewleta tirk rind zana ke, eke na mehkama roniyoy, a mehkama de, aya bi xo sûcdar vejiyo û hesabê hezarana kurdano ci ra pers bo û çiyoy ke kişyayîne Talat Paşay de ame dewleta Osmanîyan ser, oyo bêro dewleta tirk jî sere.

(Ser ra 1923'ê de Talat Paşa Almanya de hetê jew xortê ermeniya kişiya. Dewleta Almanya o xortê ermenî tepîşt û vet mehkama ver û wîja ê xortê ermenî, Dewleta Osmanî ra hesabê qirkerdina ke ser ra 1915 de şarê ermenîyan rê virazi-yabi pers kerd. Peyniya a mehkama de Dewleta Osmanî sûcdar vejiyê).

Coka dewleta tirk mehkamaya navneteweyî nêwazena. Çi ke verê Öcalanî dewleta tirk kursiyê sûcdarîne a mehkama de ronîşo û hesabê kerdenanê xo bido. Hem jew hesabê 15 seranê peynan jî nê, hesabê verinan jî. Yanê hesabê serhewadayanê verinan. Bibo ke rewşê ewroyîni de na mehkama meronîyo û dewlet hesabê kerdenanê xo medo. Feqet wa, her kes rind bizano a mehkamaya roniyoy. Ewro nêbo meşt, meşt nêbo biro, peynî de a mehkamaya roniyoy û êkê kişyayîne Talat Paşay de amey dewleta osmanîyan sere iyê bêrê dewleta tirk jî sere.

MEMED DREWS

Tu pir bilind î ey şehîd
Ji çiyay bêhtir
Sînga te jî ava derya
fîrehtir
Her giranbiha yî
Ji her rûmetê bilintir"



Av. Şevket
Epözdemir

Roja 26.11.1993'an bi guleyên hêzên kontra tu ketî nava refên pakrewanan. Şerê te riya me ronî dîke.

Emê bi xwîna xwe bigihêjin berbanga azadiya kurdan. Em dê bi etûna di giyana we de roja rizgariya kurdan biafirînin. Tolhildan navê we ye.

Li ser navê malbata wî

NIMETULLAH, BÊNAN, GULISTAN, PERWÎN,
BELKIZ, RÛMET, FERÎT EPÖZDEMİR; MUCÎP
SEVÎNÇKAN, DEMİR û AZADE SEVÎMLÎ û ŞIVAN

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN

■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308

Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212)
245 16 50 - 251 79 37 - 251 90 13
FAX: 251 95 85

■ Gerîndeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN
■ Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BIRYAY Dağıtım

■ NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83

■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmir
Tel: 0 (232) 425 37 02

■ Edene
Tel: 0 (322) 351 42 78
■ München:
(Nünerê Giştî yê Ewropayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815

■ Swisre:
İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07

■ Hollanda:
S. A. Fewzi
Tel-Fax: 31 10 48 555 43

■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsiw

20 saliya PKK'ê li çarmedorê cîhanê hate pîrozkirin

Afirînerên wê rojê nayê jibîrkirin

Meşvan bi coşeke mezin meşyan û sloganên wekî "Apo li Romayê ye, Komara Tirk ketiyê komayê", "Bi can bi xwîn em bi te re ne ey Serok!", "Bijî PKK, ERNK, ARGK", "Serok Apo roja me ye tu kes nikare tarî bike." hest û dilgermiya xwe bi lêv kirin.

Di dîroka gelan de rojên dîrokî hene. Gel an jî netewe di van rojan de li kakilê xwe vedigerin, bi hêza xwe dihesin. 27'ê Sermawezê jî bo kurdan xwedî wateyeke bi vî rengî ye. Lewre jî, heta ku gelê kurd hebe ne 20 sal, sed sal jî, derbas bibe ev roja pîroz û bêhempa nayê jibîrkirin.

Ji bo vê jî, kurd her sal di vê rojê de pîrozbahiyên berfireh li dar dixin. Di meş, şev û gelek çalakiyên bi vî rengî de, kurdên ku li çarmedorê cîhanê belav bûne di vê rojê de li hev dicivin, li aliyekî şehîdên xwe bi bîr tînin li aliyê din jî, girêdana bi serokê xwe re careke din nîşan didin.

Ev çalakî wekî her sal îsal jî bi dilşadî û coşeke mezin hatin lidarxistin. Kurdên ku ji welatê xwe dûr, li Ewropa û li gelek welatên din dijîn, 27'ê Sermawezê bi dilgermî pîroz kir. Pîrozbahî û çalakiyên herî mezin li Bonn, Hamburg û Strasburgê pêk hatin.

Li Bonnê 20 hezar kes meşyan

Meşa Bonnê bi navê "Meşa Azadiyê" hate lidarxistin. Şilî jî, nebû asteng û 20 hezar kurd, di kortejên kesk û şîn de meşyan. Di meşê de posterê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, alên ERNK, PKK, ARGK û pankartên ku şerê qirêj şermezar dikin hatin vekirin. Her wiha partî û rêxistinên çepgir ên tirk MLKP, TKP (ML), TDP, TKPKîvîlcîm, Bolşevik Partizan, DHP û rêxistina asûrîsuryanî ya bi navê Rêxistina Şoresger a BethNahrîn jî cih girt.

Meşvan bi coşeke mezin meşyan û sloganên wekî "Apo li Romayê ye, Komara Tirk ketiyê komayê", "Bi can bi xwîn em bi te re ne ey Serok!", "Salvegera PKK'ê pîroz be", "Bijî PKK, ERNK, ARGK", "Serok Apo roja me ye tu kes nikare tarî bike." hest û dilgermiya xwe bi lêv kirin. Piştî meşê, meş-

van li hemberî parlamentoya Almanayê ya kevn kom bûn û li vir mîtîngek hate lidarxistin.

Li vir, piştî muzîk û axaftinan Öcalan ji dengê xwe mesajek jî bo meşvanan pêşkêş kir. Öcalan di axaftina xwe de meşvan ji ber çalakiyên wan pîroz kirin û xwest ku çalakiyên grevên birçibûne bi dawî bibin.

Wekî meşa Bonnê, li Bajarê Hamburgê 8 hezar û li Bajarê Frensa Strasburgê jî nêzî 3 hezar kurd meşyan. Di van her du meşan de jî, meşvanan salvegera 27'ê Sermawezê pîroz kir û ji dewleta Îtalya xwest ku mafê siyasî bide Öcalan.



Li Stockholmê pîrozbahiyên bi coş

Di çarçoveya pîrozbahiyên salvegera PKK'ê de li Paytexta Swêdê, Stockholmê meşek hate lidarxistin. Meşê li Meydana Humle Gordenê di sê 12.00'an de dest pê kir. Çalakdarên kurd di meşê de xwest ku dewleta Swêdê di çareserkirina pîrgirêka kurdan de bi awayekî aktîf tevbigere. Nêzî 2000 Kurd tevli meşê bûn. Dostên kurdan ên Swêdê jî, piştgirî dane meşê. Her wiha partiyên kurd ên siyasî yên wek Yekîtiya Niştimanê Kurdistan (YNK), Partiya Demokratê Kurdistanê (PDKÎ), Partî Zehmetkêşan û Partî Sosyalîstê Demokratê Kurdistan (PSDK) jî, di meşê de cih girtin. Di meşê de van partiyên mesajên xwe pêşkêşî meşvanan kirin û piştgiriya xwe ji bo Öcalan anîn zimên.

Li ber Behra Spî jî, pîrozbahî hebûn

Wekî kurdên her derê, kurdên Lubnanê jî, salvegera damezrandina PKK'ê bi coşeke mezin pîroz kir. Ji bo salvegera damezrandina PKK'ê li paytexta Lubnanê Beyrûtê bi beşdariya bi hezaran kurdî şevê hate lidarxistin. Şevê li salonekê pêk hat. Kurdên Lubnanê di şevê de, girêdana xwe ya bi Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan re careke din anîn zimên. Her wiha kurdên Kanada, Awûstralya û DYA (Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê) jî, 27'ê Sermawezê pîroz kir.

